

## Kurdistana Iraqê di navbera du agiran de

□ Tirkiyê ji roja ku birtyara xwe daye ku ew jî bi "qerta Kurd" bileyize û vir de ciyê xwe li dor masa ku Iran-Iraq-Sûriye li dor rûniştine, xweş kiriye û bi hostatî bi vê qertê dileyize.  
 □ Eger Kurd bi zanîn rê li ber van lîstikan negrin, xetera trajedyen nû yên birakujiyê zêdetir dibe.



Malwîraniya di navbera du agiran de...(Foto: Armanc)

Hîn xelkê Kurd birînên xwe yên trajediya buhara çûyi neke-wandine carek din bû armanca êrisen nû yên Tirkiyê u Iraqê.

Iraq ji aliye kî guftûgoyan di-rej dike, bi vê riye bîna xwe ve-dide, ji aliye din ve jî quweta xwe ya leşkerî li Kurdistanê xurt dike, qewetên teze lê zêde dike û carca-ran bi riya provakasyonan êris dibe ser Kurdistanê, tehdîda xwe ya li ser gelê Kurd didomîne. Dîsa bi provakasyonekî leşkerên Iraqî meha çûyi êris birin ser ba-jarê Silêmaniye. Di vê êrisê de bi sedan kes hatin kuştin.

Hîn êrisa Iraqê li Başûrê Kur-distanê dom dikir, bi bahana kampê PKK'ê leşkerîn Tirk jî ji bakur bi balafirîn êris birin ser Kurdistanâ Iraqê. Roja 11'ê Çiriya Pêşin 8 balafirîn Tirkîyê 20 km ji hudûdê Tirkîyê ber bi hun-dire Kurdistanâ Iraqê ve gundê-n Banik, Silan, Siyar, Surya u Bê-gûva bombebaran kirin. Di vê êrisê de 3 pêşmerge mirin û bi dehan kes birîndar bûn. Xelkê van gundan dan diyarkirin ku li herêma wan, ne hevalbendê-PKK'ê û ne jî meqerên wan hene. Cepha Kurdistanâ ev êris protesto kir û da diyarkirin ku heger Tirkîyê bi vî hawî dom bike, ewê giliyê Tirkîyê li Yekîtiya Nete-wan bikin. Xelkê Zaxoyê jî bi alîkariya cephê, ev êris bi mitîngêkî protesto kir. Leşkerîn Tirk di roja 25'ê Çiriya Pêşin de bi bahana bersîvdayina êrisa PKK'ê ya Çelê (Çukurâ) ku 17 leşke-rên Tirk mirin, êriskeke nuh bir ser Kurdistanâ Iraqê. Di bin siwana balafir û helikopteran de bi hezaran leşkerîn Tirk bi dirêjîya 10 km ketin erdê Kurdistanâ Iraqê.

Xuya ye ku ji armancê gi-ring ên van êrisan ew e ku Kurdan-bera hev bide û nîşanî raya giştî ya xwe û ya derve bike ku "çavka-nîya mesela Kurd û şerê çekdarî ne li hundir, lê li derve ye."

Her wehak tê zanîn derîyê Kurdistanâ Iraqê yê ku iro ji din-yayê re vedibe, bi tenê derîyê Xabûrê ye. Tev ticaret û alîkari di vî derîyê dibe. Sînorê Kurdistanâ Iraqê yê li ser Kurdistanâ Tirkîyê di bin kontrola pêşmerge de ye û Cebha Kurdistanâ di vê qonaxa-hessas de bes ji bo pirsên cînartî-yê û sînoran jî be, bi awayekî divê têkiliyên xwe bi Tirkîyê re di seviyekî de bigre û şikleki bide van têkiliyan. Lewra jî li ser sînorê Kurdistanâ Iraqê, Kurd muhtacî istiqrîr û aramîyê ne.

Tirkîyê ji roja ku birtyara xwe daye ku ew jî bi "qerta Kurd" bileyize û vir de ciyê xwe li dor masa ku Iran-Iraq-Sûriye li dor rûniştine, xweş kiriye û bi hostatî

bi vê qertê dileyize.  
 Eger Kurd bi zanîn rê li ber van lîstikan negrin, xetera trajedyen nû yên birakujiyê zêdetir dibe.

Mesûd Barzanî bi beyana xwe ya dawî, da diyarkirin ku haya wî ji vê leyistikê heye. Wî got: "Heger êrisen Tirkîyê dom bikin, emê têkiliyên xwe yên bi Tirkîyê re bibirin, nûnerê xwe yê Tirkîyê paşde bikşînin. Deriyê Xabûrê bigrin. Têkiliyên xwe yên bi PKK'ê re qutkirî di ber çavan re derbas bikin". Vê beyanê dilê ge-lek Kurdan xweş kir. Lê di beyan-nê PKK de tu guhertinek tuneye, dijminkariya li dijî serokatiya Cepha Kurdistanâ dom dike. Ji alî din de Iraq jî li gor berje-wendiyên xwe yên li ser xwîna Kurdan bejîndayî, pêçika xwe ki-riye nav vê leystikê. Ciyê bêbex-tiyek ji bo Kurda hebe ma dibe Iran jê dûr be, wek her gavî bi fisgenitî wê jî ciyê xwe girtiye.

Dijminan ji çar alî ve dafik li ber me vedane û bêguman daxwa-za ku Kurd li hev xin jî tê de di-xwazin tev riyan bi kar bînîn. E-ger em çokên xwe neşidînîn, xwe ji xeterê dûr nexin, emê bikevin dafikîn wan.

Mîrza Bextiyar

### Seva Armancê

Sîvan Perwer Delal Nasir Rezazi  
 Ciwan Haco  
 Slayt Helbest Govend  
 Spiker: Mahmut Baksi

Cih: Folketshus- Stockholm  
 Dem: 14. 12. 1991  
 Seet: 16.00

Hilbijartinê Li Tirkiyê

### Li Kurdistanê HEP'ê rayên SHP'ê zêde kirin

■ Tu partiyekê di meclisê de piranî nexist destê xwe, lê DYP bû partiya herî mezin. Gelo Demirel wê bi partiyekê din re hukumetekê koalisyonê deyne?

■ ANAPê piraniya xwe ya meclisê winda kir.

Li Tirkiyê di 20'ê Çiriya Pêşin de hilbijartina giştî ya par-lamentoyê çêbû. Şeş partî ketin hilbijartinê. HEP'ê di hilbijartinê de bi SHP'ê re tifaq kir û herdu partî li ser navê SHP'ê ketin hilbijartinê. RP(partiya dînî ya Nec-

meddin Erbakan) jî bi partiya faşist a Turkeş û partiyekê din a biçük re tifaq kiribû. Berî hilbijartinan bi bihîstina vê tifaqa bi partiya faşist re, endamên RP yên ge-lek herêmîn Kurdistanê bi acizi-

Dâmahîk: r. 11

BAJAR	B	ANAP	SHP	DYP	RP	DSP	SP
<b>Adiyeman</b>	25	20.29	27.15	4	24.87	24.88	2.42 0.36
<b>Entab 1</b>	25	18.53	29.44	4	25.93	2	16.80 0.42
<b>Entab 2</b>	25	20.29	25.48	1	30.31	2	19.34 4.20 0.35
<b>Meras 1</b>	25	19.62	15.77		27.56	1	35.20 3 1.34 0.49
<b>Meras 2</b>	25	16.72	23.44		23.02		33.53 3 2.90 0.37
<b>Meletiye</b>	20	41.48	4	26.28	1	6.56	22.58 1 2.93 0.44
<b>Sêwas</b>	20	17.66	23.03	2	13.32		38.29 4 7.21 0.46
<b>Tunceli</b>	25	10.72	57.90	2	3.42		5.60 1.63 1.06
<b>Elazîz</b>	25	18.60	15.49		33.79	2	29.25 2 2.37 0.46
<b>Bingol</b>	25	17.94	17.95		27.78	1	34.67 2 1.28 0.36
<b>Erzincan</b>	25	28.80	1	33.32	2	12.81	22.02 2.66 0.37
<b>Erzurum 1</b>	25	21.72		5.36		31.29	1 37.46 3 3.73 0.40
<b>Erzurum 2</b>	25	17.42		14.14		28.54	1 36.31 2 2.91 0.66
<b>Qers</b>	20	16.91	31.09	3	26.97	2	7.07 17.26 0.72
<b>Agrî</b>	25	26.58	2	15.34		28.18	2 22.22 2.53 0.65
<b>Mûş</b>	25	17.52		42.30	3	14.73	23.61 1.35 0.47
<b>Wan</b>	20	26.26	1	22.30	1	26.47	2 22.52 1 1.76 0.62
<b>Hekari</b>	25	43.00	1	19.03		29.60	1 6.34 1.04 0.94
<b>Bedlis</b>	25	31.22	2	21.88		13.97	29.14 1 2.90 0.51
<b>Sert</b>	25	18.27		39.52	3	18.96	20.55 1.53 0.46
<b>Batman</b>	25	16.00		52.71	3	14.71	15.30 0.90 0.34
<b>Sîraex</b>	25	18.43		62.16	3	14.81	2.58 1.11 0.88
<b>Mêrdîn</b>	20	18.43		53.99	5	17.12	8.73 1.30 0.40
<b>Diyarbekir 1</b>	20	17.99		35.02	4	25.00	13.30 3.44 0.61
<b>Diyarbekir 2</b>	25	6.85		71.61	3	10.49	9.64 0.99 0.40
<b>Ruha 1</b>	20	24.27	1	19.88		28.44	3 24.56 1 2.50 0.32
<b>Ruha 2</b>	25	29.96	1	21.79		35.43	2 9.96 2.78 0.34

Li bajarên Kurdistanê miqaysa dengan li gor partiyen li ser esasê %

Rojeva Mehî

## Uzira ji qebehetê mestir

Ji 88'an 20 parlamenteñerên Partiya Sosyaldemokrat en ku di 20'ê Çiriya Pêşin de hatin hilbijartîn ew kes in ku li ser navê HEP'ê hatibûn nişandan. Wek tê zanûn di hilbijartinan de, ji ber ku HEP nikaribû teketa hilbijartinan bi SHP'ê re tifaq kir û namzeden xwe di nav lista vê partiyê de pêşkêş kir.

Gava ev tifaq hat danin, berpirsiyaren HEP'ê ji xelkê re digotin ku tifaqa me bes ji bo hilbijartînê ye, piştî hilbijartîne parlementerên me wê disa ve gerin HEP'ê. Hilbijerên Kurdistanê ji bi vê baweriyê deng dan vê tifaqa bi SHP'ê re. Bi program û armanc û rîveçûna xwe karekterâ HEP'ê ci dibe bila bibe. Xelkê wek partiyek legal a Kurdan le dinihert û didit ku bi neheqî riya besdarbûna di hilbijartinan de li ber hatiye girtin, loma ji bi navê xwe nikare besdari hilbijartînê bibe. Yan na hilbijer ji SHP'ê nerazibûn û baweriyâ xwe pê nedianin. Heta ji bir nekribûn ku HEP bi xwe piştî qewirandina hin parlementerên Kurd ji SHP'ê, hatibû avakirin.

Lê iro; piştî hilbijartîne ev parlementerên ku li ser navê HEP'ê hatibûn hilbijartîn, bîryara xwe dane ku venegerin HEP'ê di SHP'ê de bîminin. Navê vê ji dikin berdewamkirina tifaqa HEP û SHP'ê. Beri her tiştî navlêkirineke wiha riyakarî ye, xapandina xelkê ye. Him cûne dixwazin ciyê xwe di partiya sosyaldemokrat a Tîrkan de xweş bikin, him ji bo ku ev niyeta wan zû bi zû kifî nebe, navê HEP'ê de bin cengê xwe de dihêlin.

Ev listik e, pêlistina bi hisen bawerpêanîna hilbijerên welatperwer ên Kurdistanê ye. Em baş dizanin; ji wan bist parlementerên ku hatin hilbijartîn, hemû ne dilsozên doza mili ya Kurd in, heta ji wan hinek encama hin fen û fût, dek û dolaban di HEP'ê de bi cih bûn û pê re ji gihaştin cihen wiha. Dibe ku hin ji bi hesreta ciheki wiha diqilqilin, dixwestin peydabûna potansiyela mili ya wiha ji xwe re bikin pépelük. Lê eşkere ye ku piraniya van parlementeran insanên dilsoz in, welatperwer in, dikarin di riya xebata xwe re fêdeyeke mezin bigînîn miletê xwe. Bi taybeti iro berpirsiyari li ser milen wan e ku divê li xwe varqîlin û rê li ber vê listikê, vê xapandinê bigrin.

Iro roj ne roja wê yekê ye ku vê potansiyela mili ya muazem li pey dûvikîn parti, rîexistin û muesesén dewleta Tîrk bê kişîşandin û badilhewa bê mehandin. Roj roja wê yekê ye ku di riya pêkhatîna şexsiyeteke mili ya serbixwe de gav bi gav rîexistin, parti, muesese û her awe avayîyen serbixwe yêni mili bîn avakirin. Şexsiyeta mili, divê edi bes li pey dûvikîn hinekan, le bi temami bi sere xwe di her wari de xwe nişan bide. Iro di parlementoya Tîrkiyê de ji Kurd ne muhtaci hin parlementeran e ku li nav partiyen Tîrk belav bûne, muhtaci grûbeke Kurd a serbixwe ne ku li her derê wek grûba parlementeran Kurd bê qebûlkirin û her gav mewqisekî Kurdiyê yê mili xuya bike.

Rê ev e, realita Kurdistanê vê yekê radixe pêş çavan û hilbijerîn Kurdistanê ji bo vê yekê deng dan van û ew kirin parlementer. Eger ew dikarin bi vê berpirsiyarta xwe rabin, bila rabin, yan na eger mesele ciyê xwe xweşkirin e, bila navê berdewamkirina tifaqe li vê yekê nekin û uzra xwe ji qebehetâ xwe mestir nekin.

## Bi xêr hatî

Xwendevanen delal!

Ji vê hejmarê û pê ve heval **Mahmûd Lewendi** wek endamê redaksiyonâ Armancê û berpirsê quncika "Beroş" li me zêde bû.

Bi xêr hatî **Mahmûd Lewendi**

Redaksiyon

Redaksiyon: M. Elî Zînare Xamo,  
Hesen Mizgin, Mirza Hekîyar, Lewendî Fîrat,  
S. Revin, Mahmûd Lewendi  
Redaktör berpirsiyari: M. Elî  
Berpirsiyare beşî Dîmlîkî: Mahmîsanî

Adres : Armanc  
P. Box: 159-16  
161-15 Stockholm  
Sweden

Telefon:  
46-8-303195

Telefon:  
46-8-3018223

Anayasaîzgîzgîzveren  
Kurdîstan Demokratîka  
Arbeter Unionen  
Postadress: 502 37 Göteborg  
Telefon: 031-45 7333

# Navê Konferansa Îsraîl û Ereban kirin "Konferansa Rojhilata Navîn"

Bi navê "Konferansa Rojhilata Navîn" (!) konferansa Îsraîl û Ereban li Madrîdê civiya. Piştî 43 sa-

lên ser, Ereban û Îsraîlî li dora "ma-sa aştiyê" hatin ba hev.



Ereb û Îsraîl li ser riya Madrîdê

Karikatur: TOM

Ev demeke dûr û dirêj bûku Bush, ji bo "konferanseke Rojhilata Navîn" dixebeitî. Ji bo pêkanîna konferanseke weha wi, Wezirê xwe yê Derva Baker 8 caran şand herêmê. Ü Baker dawîya dawî di wezîfa xwe de bi ser ket; "Konferansa Rojhilata Navîn" di 30'ê Çiriya Pêşin de li Madrîdê ji alî serokwezir Felipe Gonzelas ve dest pê kir. Dewra pêşî ya konferansê wê du rojan bajo. Tura duyem ji wê roja Yekşemê dest pê bike. F. Gonzales di axaftina xwe de got; "Iro hêviyek heye, divê ev hêvi neyê şikandin".

Ji alî Ereban wek dewlet; Sûriye, Lubnan û Urdun di konferansê de besar in. Misir

jî wek çavdêr besar e. Filistinî jî ne wek heyeteke bi serê xwe, lê wek grûbek di nav he-yeta Urduniyan de besar di-bin. Hayder Abdel Şâfi serokatiya grûba Filistinîyan dike. Li aliyê din Îsraîl jî di bin serokatiya Şamîr de di konferansê de ciyê xwe digrin.

## Aştiya Rastîn

Di roja pêşî ya konferansê de bêyi F. Gonzales, Gorbaçov û Bush jî peyivin. Wan ji di axaftinê xwe de wek F. Gonzalez, doza kompromîsî li hemû terefân kirin û pesnîn aştiyê dan û hêvi kirin ku ev fir-senda tarîxi ji dest neyê ber-dan. Bush di axaftina xwe de

## V. Kumruaslan



Barzan Sasiwar û Hîwa Zendî di programê de..

# Seminera Abûqatên Kurd

Di 11'ê Çiriya Pêşin de li Es-kilstunayê, di 12'an de li Uppsala'yê û di 13'an de ji li Stokholmê abûqatên Baroya Diyarbekirê, Mistafa Ozer û M. Sezgin Tanrikulu li ser Qanûna Antî-Terorê semîner dan. Semîner ji alf Federasyona Komelên Kurdistanê ve hat organizekirin û gelek kes di semîneran de besdar bûn.

Herdû abûqatên Kurd li ser sebebên rakirina xalêñ cezayêñ qanûna 141, 142 û 163 û derxistina Qanûna Antî-Terorê sekînîn. Sekreterê Baroya Diyarbekirê M. Sezgin Tanrikulu di ahaftina xwe ya Stockholmê de got ku; "Bi rakirina xalêñ 141, 142 û 163 û derxistina Qanûna Antî Terorê, dewletê bi kevirekî li du çukan xist. Dewletê bi rakirina xalêñ 141, 142 û 163 li ser raya gişîya cîhanê û ya Tirkîyê intîbayeke baş hîş ji ali din ve ji bi derxistina Qanûna Antî-Terorê cezayêñ hîn hişk derxist ku ji ali raya gişît ve ev baş nehatiye fahmkirin."

Abûqatê Mîstefâ Ozer ji dûr û dirêj li ser antî-demokratbûna qanûnen Tirkîyê sekînî û got ku Qanûna Antî-Terorê ji yek ji wan



Abûqatê Baroya Diyarbekirê Mustafa Ozer (yê çepê) û M. Sezgin Tanrikulu li Swêdê li ser "Qanûna Antî Terorê" çend semîner dan.

e û li diji şoreşger û pêşverûyen Tirk û Kurdan e.

Ev Qanûna Antî-Terorê di Nisan 1991'ê de piştî serfîldanêñ

girseyî ku li bajaren Kurdistanê çebûn, hate derxistin.

□

## Parlamenteñ HEP'ê nema ji SHP'ê vedigerin

### Îtîfaq bû îltîhaq

Di hejmara çûyi ya Armanç de me şika xwe ya di derheqê îtîfaqa HEP û SHP'ê de diyar kiribû û me gotibû "çûn zeyîtiyê û gelo wê nema vegeerin"?

Mixabin, ew şika me rast derket. Îtîfaqa HEP'ê ya bi SHP'ê re bû îltîhaq.

19 parlamenteñ ku li ser navê HEP'ê di listeya SHP'ê de qezenc kiribûn û 3 parlamenteñ SHP'ê yên ji herêmê roja 25 û 26'ê Çiriya Paşin, li Diyarbekirê civiyan. Rojeva civînê bes maddeyek bû: wê ji SHP'ê veqetin an wê bi pê re bimînin. Lî biryar hat girtin ku

Parlamenteñ ku di civîna

wê bi SHP'ê re bimînin. Her çiqas berî hilbijartinan bi dengekî bilind digotin: "Em bi SHP'ê re nebûne yek, em pê re îtîfaqê dikin". Ji xwe ji ahaftanen serokê HEP'ê yê kevn Fehmî Işiklar dihat fêm kîrin ku wan bîryara xwe ji berê ve dane. Heta wî di beyanana xwe ya ku di 23'ê Çiriya Pêşin de dabû rojnama Cumhûriyetê, gotibû "Emê SHP'ê bikin partiyek demokrat". Gava Fehmî Işiklar û hevalen wî bi xebata "demokratkirina SHP'ê" bibilin ne diyare ku di rojêñ pêş de wê ci bê serê HEP'ê.

□

## Swêd

### Kongra Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd



Bîstek ji kongrê; ji çep ber bi rastê; Cemal Reşîd, Malmışanî û Mehmet Uzun  
(Foto: Arif Zêrevan)

Di 26'ê meha Çiriya Pêşin de, li Stokholmê, kongra 3. a Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd li dar ket. Nêzîki 30 nivîskarêñ Kurd

besdarî kongrê bûn. Ji besdaran yek ji şairê navdar Dilzar (71 sali) bû.

Piştî hilbijartina dîwanê, rapo-

rêñ xebatê hatin xwendin. Di rapor de giliyê wan ê herî girîng ew bû ku Yekîti ji ali aborî ve pir qels e, ji xwe ji ber wê yekê ji tenê hejmareke kovara Nûser derketiye.

Hunermendê Kurd, Nasir Rezazî pêşniyarek anî da ku çend şev-ahengan çêke û hemû pereyên ku ji van şev-ahengan werin wê wek alîkarî bide Yekîtiya Nivîskaran. Ev pêşniyara wî ji ali hemû endaman ve hate qebûlkirin û wek organizator ji wî bi xwe ev bar hilda ser xwe.

Piştî munâqeşe û daxwaz û bîryan, ji bo Komîta Karger a nû van kesana hatin hilbijartin: Xebat Arif, Mahmûd Lewendî, Nasir Rezazî, Xelîl Dihokî, Hêriş. Cigir: Cemal Reşîd, Rizgar Ebulla.

□

**NEYNIK**

Bavî Nazî

### Nivîseke bê nav

Piştî dûrbûna sê rojan ji malê, bi vegera xwe minbihist ku mirovek ji eynî avahiya em tê de, miriye. Min çiqasî dîmenen mirovên cîran di serê xwe de danin ber hev, rewişten mirî "li gora gotinênu ku ji min re hatin gotin", yek ji wan ji li hev nedihatîn. Tevi weha ji dilê min li ser yekî rûnişt. Edî min çavêñ xwe li wî mirovî gerandin, da ku baweriya minbibe yeqînî, yan ji bibe derew....

Vêga min di dilê xwe de digot; heger ez pêrgî wî mirovî bêm, ezê wi hembêz bikim, maçî bikim û bi jiyanê, wî pîroz bikim. Lî ku hat û bi rastî ji yê mirî ewbe, edî diviyabû ez biçûma ser gorra wî û min deynê xwe yê cîrantiyê û insanetiye lê vegeanda.

Bi xwe berdewama vê bûyerê edî dibe babeteke din û ezê bi pey nekevîm. Lî ev nayê wê me'nê ku ez pêwendiyen civakî û insanî wilo sivik dibinim û wan di ser guhê xwe re davêjîm. Ji ber vê yekê ji jiyanâ mexlûqen bi meqamên xwe ji me insanân këmtir, wêbihèle ku ez cardin li pirêza xwe vegerim....

Li gora tê gotin, pêla hespek di ber kelexê hespekî din re derbas dibe, hêşir ji çavêñ wî dîbarin, pêre pêre ji berê xwe diguhere û bi riya xwe de diçe... Dibêjin dema li selexanê berazekî serjê dikin, yê li pey wî xwîna hevalê xwe dalêse û vedixwe...

Wilo ji dibêjin ku çiqasî mihê bi ali selexanê ve didehfinin, her ew xwe dide paş. Lî gava bizinekê di pêsiya wê re derbas dikin, mîhi yek bi yek xwe didin ber serjêkirinê...

Bi xwe li ser kûçikan gelek tiş tê gotin. Li gor gotinek ji wan, gava kûçikek nexweş dikeve, ku nexweşîya wî ya mirinê be, kûçikên din xwe jê dûr dixin, xwe lê nakin xwedî. Lî ku nexweşîya wî ne ya mirinê be, sexbêriyê lê dikin, lê miqate dîbin û dibêjin temenê kûçik kin e, ji ber ku her tim çavêñ wî li destâ ye, li ber deriya ye, li hêviya kûrtèlekê ye...

Her weha ji tê gotin ku teyrê hur berî mirina xwe difire û bi termikî xwe ber dide jêr û xwe dikuje...

Li gel ku ev wêne tev ji ne pêwîstî ravekîrinê ne; xwendevan wan bi hêsanî fam dike û li gor têgihiştina xwe ibretan jê derdixe. Lî her ezê qewitiya xwe bikim, gotina xwe bibêjîm; heger mirov giyanê mirovatiyê di xwe de biparêze, ewê wek hesp spehî be. Ku mirov xwîna toxumê xwe birêje, ewê wek beraz be. Heger mirov gava xwe bê pîvan bavêje, ewê wek heywanan bê his be.

Heger mirov bixwaze rûmeta xwe biparêze, divê ew çavêñ xwe wek kûçikan pehn neke, teriya xwe li ber dertiyan nehejine. Heger mirov di nava xwe de aza be, ew bikeve ci rewşê ji, ewê her bilind bilind bifire.

## Almanya

### Gavek nuh ji bo xebata bi hev re

Li Almanyayê di navbera 13-15'ê ilionê de di navbera gelek rêxistinêñ Kurd de civînek çebû. 60 kes ji Almanya, ji Hollanda û ji Belçikayê tevi civînê bûn. Di civînê de bi dûr û dirêjî li ser gelşen Kurdistana Bakur hate rawestandin û ji bo çareserkirina van gelşan dîtin û pêşniyar hatin pêşkêşîrîn. Di dawîya civînê de ji bo ku pêşniyar û dîtinêñ besdarîn konferansê ji ali bîrûraya gişî ve bête zanîn, bi Tirkî belavokek belav kirin. Di belavokê de tê gotin ku:

-Di roja iro de him li hundur û him ji li derva hewcedarî bi platformeke ku xwedî temsileyeke muşterek be û hemû hêzên Kurdistana Bakur bigre nav xwe (ci rêxistin, der û dor û kadi-rêñ yek bi yek) heye.

-Kesên besdarî ve konferansê bûn, ji bo ku ji fikir û praktika ve yekê re xizmet bikin, ji bona amadekrina "Konferanseke li Derve" bicive wê xebatê bikin.

-Ji bo ku li Almanya, li Hollanda û li Belçikayê ji bo avakîrina rêxistinê bi vî rengi, yan ji bo yên berê hene bêne ba hev, wê xebat bê kirin.

-Daxwaza civînê ew e ku, komîsiona ava bibe, ger hebin, li welatên din bi komisyonen wiha re hevkariyê bike û ji van komisyonan rêxistîneke bi navê "Komîsiona Dervâ" bête avakîrin.

-Divê têkîli bi tevgerên li welatên ku xebatên wiha dimeşînîn re bête danîn.

-Besdarîn civînê pêşniyar dikin ku li dervayî welet rêxistinêñ meslekî, kulturî, sosyal, humanîter û dîni, yanî muesesên netewî bêne avakîrin.

-Li ser vî esasi, li Almanya, li Hollanda û li Belçikayê ji bo avakîrina rêxistinê bi vî rengi, yan ji bo yên berê hene bêne ba hev, wê xebat bê kirin.

-Li welet wê piştgiriya tevgerên ku dixwazin muesessên netewî (ji bo ziman, tarîx, enstitütên ji bo legerînên kulturî, ajansên nûcegîhanî, rojnameyeke rojane, rêxistinêñ ji bo legerînên ekonomik û hwd.) ava bikin, bête kirin.

-Li Ewrûpayê ji bo ku xebatên pressî û weşanî bêne organizekirin; ajanseke nûceyan a netewî û buroyen informasyonê yên Kurdi bêne avakîrin, wê xebat bête kirin.

## RAMANÊN RAMANWERAN

Krîzên di jiyana xerîban de

# "Tu ji kîjan welatî têyî?"

Abîde Diyarbekirî

Çaxa mirov rastî Swêdiyekî tê, pirsa wî ya herî pêşî; ev e "tu ji kîjan welatî tê?". Ev yek jî xerîbiyê tîne bîra mirov û mirov fam dike ku mirov ji Swêd û civaka Swêdiyan cihê ye. Ev hîs di psikolojiya mirov de şopekê dihêle. Bi van hîssan û promlemên din ên wek; bêkarî, bê mal û bê xanî bûn û nezanîna ziman, bi xwe re krîzên kûr tîne holê, carna dikare mirovan bibe hetta qonaxa xwekuştî.

Ez dixwazim di vê nivîsê de bi kurtî qala sedemîn krîzên di prosesa xerîbiyê de bikim. Di destpêka jiyana mihacirîyê de mirov xwe li derveyî civata Swêdî his dike û ji ali hissî ve mirov xwe tenê dibîne, tenêbûn û izolebûn dibe perçeyek ji jiyana rojê. Mirov dikeve hissîn welê ku êdî qiymeta xwe ya însanî winda dike. Anglo li vî welatê nuh, tu ne tiştek i, ji ber ku tu bi ziman, adet û toreyên wan nizanî û di civatê de mewqî û karîyereke te ji tuneye, tu tenê mihacîr i. Wê çaxê welatê te tê bîra te. Ji ber ku tu li welatê xwe tiştek bûyî, huwîyeteke te, şexsiyeteke te hebû. Tu însanelekî siyasi bûyî, dost û heval û dora te hebûn. Li welatê te têkiliyîn însanan cihê bûn. Yanî bi kurtî mirov bi laşê xwe li vir e, lê bi his û mîjîyê xwe ji li welatê xwe ye. Di vê rewşê de her tiştekî welatê mirov ji mirov re şérîn e. Hemû tiştekî negatif ên derheqê welatê xwe de ji bo demekê mirov ji bîr dike. Her tiştekî vî welatê nuh ji ji mirov re taħî û ne xweş tê, mirov rexne li her tiştekî wan digre. Mesela bi hîsanî mirov dibêjî; Swêdî sar in, nezan in, namûs bi wan re tuneye û hwd. Rexne tê merheleyeke welê ku êdî mirov mihacîr bi tevayî ji civata Swêdî nefret dike, xwe nêzî Swêdiyan nake, tene têkiliyî bi hemwelatiyîn xwe re datîne.

Bi taybetî, his û mîjîyê însanîn siyasi her wext li ser gelş û pirsîn civata wan e, û her gav di hazırlîya vegeva welatê xwe de ne, li gor wê ji plan û programa xwe çedîkin. Dibêjîn emî isal herin, sal tê û derbas dibin, ew hîn ji di nav xem û xeyalîn xwe yên vegeva de ne. Ne dikarin vegevin welatê xwe û ne ji li vi welatê nuh bi cih dibin.

înkâr dikin. Hetta carna dijminatîya civaka xwe ya berê dike. Li insan û kultura xwe xwedî dernakevin, ji eslê xwe, ji huwîyeta xwe şerm dike, her tiştekî welat û civaka xwe negatif dibînîn. Yanê dikevin rewşa xwe-înkarkirinê. Lî rastî ew e ku têkiliyâ wan çiqasî bi civaka Swêdî re hebe bila hebe, her çiqas xwe wek Swêdiyekî bibînîn ji, ew xerîb in, ne Swêdîne, ji ber ku rehê wan, kultura wan

**Bi taybetî, însanîn siyasi her wext his û mîjîyê wan li ser gelş û pirsîn civata wan e, û her gav di hazırlîya vegeva welatê xwe de ne, li gor wê ji plan û programa xwe çedîkin. Dibêjîn emî isal herin, sal tê û derbas dibin, ew hîn ji di nav xem û xeyalîn xwe yên vegeva de ne. Ne dikarin vegevin welatê xwe û ne ji li vi welatê nuh bi cih dibin.**

cihê ye. Ji xwe civaka Swêdî ji wan wek Swêdî qebûl nake. Ev kes ji bêyî ku lê varqilin û bizanibin, dikevin krîzeke ciddî.

Bi kurtî ev herdû mîsalen ku me li jor qal kirin ji ali psikoloji ve di jiyana xerîbiyê de işaretên krîza pêşin in.

Piştî vê krîza yekem, di jiyana xerîban de krîzên kûrtî dikarin derkevin. Di vê merhelê de şika ji jiyana tê rojêvî, mirov dest pê dike ji xwe di-pirse "ez ki me? Jiyana min a berê çawa bû, wê pêş de çawa be?" û gelek pirsîn din ên weha. Ev insan ji ali

manewiyatê ve perçe perçe ye, di hisê wî de, di hissîn wî de gelek pirs hene, lê ji bo çareserkirina van pirsan tu bersivek tuneye. Dikevin buhrana eksistensialî, û nikarin pirsîn eksistensialî û rojane ji hev veqetînin. Ji vê krîzê re di zimanê psikolojiye de "krîza şexsiyetê" tê gotin. Gelek kes di vê krîzê de di jiyana xwe de pir tiştan diceribînîn. Carna guhertînî negatif ji çedîbin; mesela problemen malbatî, hevûdu berdan, ceribandina karên cihê cihê, bi kurtî hedan nakeve wan. Nikarin xwe konsantreyî tiştekî bikin. Di jiyana de ne stabîl in.

Van krîzên ku min li jorê qal kirin, li gor insanan tê guhertîn. Ji ber ku şexsiyet, azîm, û hêza her mirovî cihê ye.

## Balans

Krîza mihacirîyê tenê ne negatif e, tiştekî pozitîf ji bi xwe re fine, û tesirî li şexsiyeta însanan ji dike. Piştî deh salan insanek di civakek xerîb de ziman, kultur û edetîn wê civakê fêr dibe, dibe xwedî perspektîveke nû. Ev hemû jê re dibin tecrubeyen nuh, bi vê perspektîva nuh li jiyana xwe ya berê dinêre, û dikeve têkili û peywendiyen nû yên reh û eslê xwe. Tiştekî baş û xerab ên civaka wî jê re zelaltîr û rontîr dibin.

Ji alîyê din ve ji bi wan tiştekî baş û adeta xwe li civaka Swêdî dîniyîn. Tiştekî baş û xerab ên di civaka Swêdî de jê re zelaltîr dibin. Bi kurtî ev keş dibin xwedîyîn du perspektîvan. Ji ali kulturî û sosyalî ve dewlement dibin. Wê wextê di jiyana wan de balansek çedîbe ku di zimanê psikolojiye de jê re dibêjîn "entegrasyon."

## MINAQEŞE PÊWIST E

Min nivîsek bi navê "Demokrasi ci ye?" ji Armancê re şandibû. Hevalen Armancê ji min re nameyek şandin û dibêjîn: "Nîvîsa we ya bi navê "Demokrasi ci ye?" ket destê me, em gelek sipas dike, tê mixabin redaksiyona me pêwîst nedît ku li ser mijarek weha fireh, nivîseke kurt çap bike."

Rast e, nîvîsa min li gor mijarek kurt e. Lî bi vê munasebetê ez di-xwazim hin tiştan bibêjîm, iro rewşa tevgera sosyalist a Kurd ci ye? Böyerên van deh salen dawîn ci tesir li ser wan kir? Li ser vê mu-naqeşeyen bingehin tên kirin.

Di vî warî de hin hêz û kes wek deh sal berê çawa bû, wele hereket dike. Yanê wekî ku dunya sosyalist têk necûbe. Wekî ku tiştek neqewimî be, dixwazin wele böyeran şirove bikin. Dîsa her wekî berê terminolojiya kevin bi kar tînîn. Ev ji tu bûyerekê zelaltîr nake. Ji realita dunyê dûr e. Bi tirkî gotinek heye dibêjîn "politîka deve-kuşuyê", yanê me serê xwe xistiye binê qûmê û wekî ku tiştek li dunyê neqewimîye, em wele hereket dike.

Hin hêz an kes ji hene ku her cendî van guherînê li dunyê dibînîn û qebûl ji dike. Lî di programen xwe de tu guhertînê cendî, cesaret nakan munaqeşeyen wan ji bikin.

Bi a min, ew prensibên ku me bi wan dest bi xebatê kir, divê em bikarîn munaqeşeyen wan bikin, rexne li bigrin. U li gor realita dunyâ iroyîn em politîkayeke bimeşîn. Yan na eme ji wê "politîka deve-kuşuyê" xelas nebin û serê me wê her di nav qûmê de bimine.

Ji ber wê yekê, nîvîsa min a bi navê "Demokrasi ci ye?" her cendî kurt e û kîlî kîmasiyen wê hene, iô armancâ min ew bû ku em bikarîn di vê meseleye de minaqeşeyekê vekin.

13.9.1991  
Zekî Seyda

Lawikê Berrîvanî

Ma fikirguherandin sûc e?

Li welêt dostekî min ê melle hebû. Gava ji gund dihat bajêr, dibû mîvanê me. Melle merivekî Kurperwer bû û kîfa wî ji kesen çep re dihat. Lî ez bi Kurperweriya mellê nedihatim serî, min dixwest wî ji wek xwe bikim komunist, Marksist-Leninist. Ji bo vê yekê ji, min tim bela xwe di melî dîda û ez diketim kirrê wî.

Di munaqeşeyen li ser dîn û siyasetê de ez dikarim bîbêjîm min tim zora melle dibir. Tu argumenteke wî ya ciddî ku pê rastiya dîn derxista navê û ez ji pê igna bikirama tenebû. Tiştekî min digot mantiqi bûn û bi tu hawî nikarîbû ew pûc bikirana. Lî cardin ji wî, xwe teslimî rastiye nedikir û nedigot welle fikrîn min çewt in. Wî, her digot "darê" min. Dawiya dawî rojekê ji min re got:

-Heyran, tişte tu dibêjî gişt rast bin ji, piştî vî umrî ez dev ji dinê xwe bernadîm û nabim komunist.

Ji bo dostê min ê melle, çewtiya fikrîn wî yên di derheqê civatê de pirr ne muhîm bûn, ya muhîm ew, wan fikrîn xwe neguherîne û heta mirinê -dixwaze bila çewtiya wan fikran iştap bûbe ji- biparêze. Li gor wî, fikirguherandin tiştekî şerm bû. Meriv Musliman ji diya xwe dibe û divê Musliman ji bimre; meriv şafî ye, divê şafî bimîne; meriv bû miridê şexkekî divê heta mirinê ji miridê wî be. Tu carî ne hewce ye ku meriv li ser rastî ya ji çewtiya van baweriyen xwe bifikire û bi çavekî rexnegirî lê binêre. Meriv ket teri-qetekê, tişte dikeve ser meriv, divê meriv heqîya teriqeta xwe biparêze û pê imanê bîne.

Dostê min ê melle, miridê şex ya ji mensûbê teriqetekê tenê wiha nafikirin, ci heyf ku iro gelek kesen çep ji kêm zêde di esasê xwe de wiha difikirin. Fikirguherandin, li rastiyeke din geriyan li ba wan ji şerm e, do me ci diparast divê iro ji em wê biparêzin. Do me digot welatîn sosyalist cinneten li rûyê erdê ne, kelayen heqî, edalet û wekhevîye ne, divê em iro ji wehâ bibêjîn. Heyatê ideolojiya me rast dermexistiye, praktîkê iddeayen me pûckirine, qet ne muhîm e, ya muhîm divê em bawerîya xwe zeif nekin.

Li gor wan, gava meriv rexne li fikrîn xwe yên berê bigire, rastiyeke ku jiyane derxistîne ortê qebûl bike, meriv dibe paşverû û berdevkê kapitalizm û emperyalizmê.

Mesela, piştî hewqas bûyer û guherandinê li dînyayê hîn ji hin heval û kesen çep hene, dibêjîn; divê em iro ji her demê bêtir li Marksizm-Leninizmê xwedî derkevin. Çimkî li gor wan komünizm, iro ji her demê bêtir muhtacî parastinê ye. Wek mesela dibêjîn, "dost û dijimin di roja teng de diyar dibin". Divê em ji di van rojîn teng de li fikrîn xwe yên berê baş xwedî derkevin û qet guh nedîn derew û propagandeyen dijimin sosyalizmê. Qetliamên Stalin, iflasa sistemê, perişaniya millet, eşkerebûna derew û sextekariyan, zulm û neheqiyen millî qet tesirî li wan nakin. Deh sal berê ci diparastin, dinya çawa tahîl dikirin, iro ji hîn wan dîtinê xwe bi pirrani muhateze dike. Yanî wek melle, bi fikrîn xwe re "sadiq" in.

Di civata me de parastina fikrekê heta mirinê wek mîraniyekê tê hesibandin. Em dizanî gotina "sozê mîrê berê" di nav Kurdistan de gelekî meşhûr e. Loma ji kesen fikrî xwe neguherîne, siyasetçiyê partiya xwe neguherîne, têni eci-bandin. Lî belê ev ecibandin ji fikrîn wan bêtir, ji fazileta miridîtiya wan re ye.

Di civata me de, li ba şoreşgeran, kesen fikrîn xwe di guherînin her çuqas bêbext û durrû bîn hesibandin ji, lê li dînyayê guherandin çedîbin, tiştekî do rast bûn iro çewt derdekevin û bi van guherandinan re însan ji fikrîn xwe di guherînin. Bê guman gava ku meriv tê guhertîn, ev nayê wê maneyê ku tiştekî me berê kirine û parastine hemû xerab û çewt bûn.

Mesela alîm ji fikrîn xwe di guherînin. Yekî alîm gava dibîne fikrîn ku berê parastine çewt in, tevilî dev ji wan berdide û ji nuh ve li rastiyeke digere. Çimkî ew dizane parastina têza tecrûban pûckirîye ne fazilet e. Wê gavê li gel "parastina fazileta fikrekê, fazileta guherandina fikrî" ji heye. Lowel dibêjî "Kesen ku fikrîn xwe neguherînin bes kesen ehmeq û yên mirî ne".

Lî ya muhîm ew e ku tiştekî tê parastin çuqasî fikr e, çuqasî his e. Heger tiştekî tê parastin fikr be, gava meriv dît, ya ji "ispat" bû ku fikrî meriv ne rast e, meriv di fikrî xwe de xapiya ye, divê meriv bi rehetî dev ji wan fikrîn xwe yên berê berde û ji xwe re li rastiyeke din bigere.

Gotineke gelek meşhûr ya Hugo heye, dibêjî:

"Fikra ku dema wê hatibe ordî ji nikare pêşiyê lê bigre".

Lî divê em vêya ji qebûl bikin; fikra ku dema wê derbas bûbe, ordî ji rabe nikare wê bide jiyandin.

## Lêkolîn

# Serpêhatiya gora Kamil Bedirxan Begê Azîzî

## Hesen Mizgîn

Di navbera 6.11.1990-11.11.1990'î de ez bi tevî grûbeke mamosteyan li paytexte Gurcistanê li Tiflisê bûm. Li wir me bihîst ku Kamil Bedirxan Begê Azîzî li Tiflisê maye û li wir çûye rehmetê. Me daxwaza ziyareta gora wî ji Kurden li Tiflisê kir. Ji me re gotin ku gora Kamil Bedirxan Begê Azîzî ji holê rakirine û nuha li wê derê rê çekirine. Lê yekî bi navê Ordixanê Şamîlê

Misto dest bi lêgerîna gora Kamil Bedirxan dike û bi xebatek bi rîk û pêk gora wî dibîne. Em tevde çûn mala Ordixanê Şamîlê Misto û me kevirê gora Kamil Bedirxan Begê Azîzî dît. Ji bo min dîtina wî kevirî bûyerek dîrokî bû û min ji Ordixan tîka kir daku ji min re bi kurtî be ji behsa xebata xwe ya lêgerîna gora Kamil Bedirxan Begê Azîzî bike. Wî got û min ji nivîsand:

Nivîsa li ser kêla gora wî:


KAMIL BEY BEDIRXAN  
AZİZİ

TEWELUD BUYE SALA 1872 YA 31 ADARÊ  
WEFAT BUYE 1934'È SALÈ 29'È NİSANÈ  
TE BI NÜRA ULMÈ XWE  
...NEWER(?) KIR QELBÈ NESLA QRAMANÈ(?)  
KURDA

ZEHMETÎ TE BI EBEDÎ WÊ DI QELBÈ  
WAN DA BIMÎNE YADIGAR

KAMİL BEY BEDIRXAN  
AZİZİ

1872 IL 31 MART DA TEVELUD ETMİŞ  
1934 IL 29 APRÈL DA VEFAT ETMİŞ



Kela gora Kamil Bedirxan Begê Azîzî (Foto: Armanc)

## Ordixanê Şamîlê Misto:

Ez ji qebila Kaşaxî me. Min di derheqê mala Kamil Bedirxan Begê Azîzî de gelek bihîstibû, ku ji bo Kurda gelek şer kirine, ji bo zimanê Kurdi xebatek hêja kirine. Bavê min ji min re ev tişt digotin.

Min bihîst ku Kamil Bedirxan Begê Azîzî li Gurcistanê dima û bo milletê me bi zimanê Kurdi mekteb ve kiriye (1928). Ew dihat diket malen Kurdistan û ji wan re digot (mezinên min ev ji min re digotin) "werin mekteba Kurda, bi ya şexa nekin."

Min bi xwe nizanibû ku ci bi Kamil Bedirxan Begê Azîzî hatibû. Çirok û desstanen Kurda wi bi xwe fêri mezinên min kiribûn û wan ji fêri min kiribûn. Ji ber vê yekê, eşqa Kamil Bedirxan Begê Azîzî kete dilê min û ez bi pey wî ketim. Min ji der û dora xwe pirs kir. Mezinên min çübûn rehmetê. Lî, piştî demekê min ciyê mezelê (gor/qebr) wî dît. Mezelê wî li Goristana Ezidiyan bû. Di dema berê de Gurec û Rûsan ji Kamil Bedirxan re digotin "Profesorê Sor".

Herkesi zanibû ku ez li pey mezelê Kamil Bedirxan Begê me. Keremê Ankasi ji di vi warî de xizmetek baş kir. Marîna Şamîl ji der û dora xwe pirs dikir. Rojekê Marîna Şamîl hate ba min û got ku yeki kevirçeker gotiye ku ew dizane kevirê (kêl) mezelê Kamil Bedirxan Begê Azîzî li kû ye. Em çûn wê derê. Mala mîrik ji li rex goristanê bû û ew bi xwe ji Kurd bû. Ciye kevirê mezelê Kamil Bedirxan Begê Azîzî şanî me da. Em çûn wê derê, lê belê li wê derê tu tişt tunebû. Li wê derê rê çekiribûn. Min çû karker anin û bi rojan ko-

## Kamil Bedirxan Beg

Nevîyê Bedirxan Beg û Apê Celadet û Kamuran Bedirxan e. Di sala 1872'an de li İstenbolê ji diya xwe büye. Di damezrandina Kurt Neşri Maarif Cemiyeti de cih girtiye. Pişti şoreşa Oktobrê ya li Rûsyayê, ji welatê xwe reviyaye çûye Tiflisê li wê derê bi cih büye. Li Tiflisê di nav Kurdên wê derê de gelek xebitîye. Mesela di 1928'an de ji bo wan mektebên Kurdi vekirine.

Kamil Bedirxan Begê Azîzî di 1934'an de disa li Tiflisê çûye rehmetê.

Bedirxanî ji ber ku ji elâ Azîzan in, ji ber wê carna navê Azîzî, an ji Azîzan ji bi kar anîne. Mesela Celadet Bedirxan di Hawarê de wek nasnav gelek caran navê "Herekol Azîzan" bi kar anîye.

ku ji Kamil Bedirxan Begê Azîzî re mezelekê çêkin daku ji me Kurdan re bibe zi-yaretgeh. Em dixwazin roja ku me kevirê mezelê wî dani, civîneke resmi çêbibe û şexsiyeten Kurdistan di vê civinê de amade bibin.




Ordixanê Şamîlê Misto: "Esqa Kamil Bedirxan Beg kete dile min û ez bi pey gora wî ketim..." (Foto: Armanc)

## W EŞANÊN

- E Pirtükên Dersê
- S Çirok
- A Şano
- N Memory
- Ê Afış
- N 31 Tipen Alfabeya Kurdi Bi Wêne

## Birê Hindekariyê

## Birê Çirokan



## H AYKURD

- A
  - Y
  - K
  - U
  - R
  - D
- Weşanên HAYKURD  
BOX 5009  
163 05 SPÅNGA - SWEDEN

## CITY

## RESTAURANG &amp; PIZZERIA

\* \* \*

Ligel biharatên Kurdi, dilê we sohbetek Kurdi dixwaze?

Wê wextê fermo werin Aşxana City!

Firavîn: 45:-

(Selete, man, rûnê nivisk, vekwarin û qehwe ji té del)

Bira: 25:-

Her roj saet ji 10 heta 01'ê kevirîye

Adres: Vasagatan 46, Stockholm  
Telefon: 08-21 27 07

# Gerrek li nav Şerebirindarêñ warwêran -II-

Murad Ciwan

Roja şeşê Tîrmehê cûn û hat û bizeveke ne wek ya her roj di nav hêzên siyasi de heye. Wê rojê, li Hewlêrê wê dewra duduyan ya guftûgoyan di navbera heyeta Cephe Kurdistanî û heyeta hukumeta Iraqê de dest pê bikira. Dewra pêşin li Bexdayê 42 rojan ajoتابû. Vê carê Kurdan tekîf kiribûn ku dewra duduyan li Hewlêrê çâbe. Xuya ye ku hukumetê jî qebûl kiriye û heyet wê bê Hewlêrê. Hewlêr paytextê otonomiyê ye. Di vê serîhildanê de, di 11'ê Adarê de hatiye rizgarkirin. Lî pişti êrişa ordiya. Saddam di 1'ê Nisanê de dîsan jî alî hukumetê ve hatiye dagirkirin. Pişti ku di navbera hukumet û Cephê de tegerawestan pêk hatiye di bin kontrola lêşkerên Iraqî de be ji çûnûhatin ji bo Hewlêrê heye. Pêşmerge jî bi çekên xwe diçin û tê.

Heyeta Kurdan ji hemû partiyen siyasi pêk hatiye: Mesud Barzanî, Celal Talabanî, Samî Abdurehman, Dr. Mahmud Osman. Hin berpirsyarêni siyasi û pîspor jî bi wan re ne. Pêşiyê wê li Şeqlawâ bêna ba hev û ji wir bi hev re wê biçin Hewlêrê. Ji Rewandizê heta Şeqlawâ 50 km, ji Şeqlawâ heta Hewlêrê jî 50-55 km ye.

## Geliyê Alî Begê

Em jî wê sibehê ber bi Şeqlawâ bi rî dikevin. Gava meriv ji Rewanduzê ber bi Şeqlawâ bi rî dikeve, divê meriv di Geliyê Alî Begê re derbas bibe. Geliyê Alî Begê geliyekî kûr û teng û asê û dirêj e. Heta niha min geliyekî wiha bi heybet li tu derê nedîtiye. Çemekî zirav di gelî re diherike, ku zi-vistan û buharan ne wiha zirav û şin û nazenin e. Wan wextan aveka şîlorabûyi û bi hêrs e. Min ne pîrsi, lê qasî ku ez dizanîm navê gelî ji navê Mîrê Soran ê bi navê Alî Beg tê ku paytextê mîritiya xwe kiribû Xelîfan. Xelîfan li alîyê başûrê gelî, li ber devê gelî hatiye avakirin. Rîyeke ziftkirî ya makînan di kûraya gelî de fetlokên tabî yênen gelî taqîb dike. Jê re dibêjin Riya Hamilton. Di wextê xwe de îngilizan ev rî vekirine ji Bexdayê anîne, di seran-serê Kurdistanê re derbas kirine ber bi Iranê de birine, bi vî awayi Bexda û Tehran bi hev ve hatine girêdan. Piştre, di van salêñ dawiyê de rî hatiye firekirin û ziftkirin ku berî serîhildanê, di esasî de ji bo armancêñ eskeri bi kar dihat.

Li rex çemê Geliyê Alî Begê; seranseri gelî, gelek kon, çadir û holik hatine dîrin ku wek warêñ qereçîyan têñ xwiyakirin. Em dipirsin dibêjin ku Kurdêñ derûdora Kerkükê ne ku di şîkestê de aware bûne, iro nema dikarin vegerin ser warêñ xwe.

Gava em Geliyê Alî Begê li pişti xwe dihêlin, em dikevin nav Xelîfan ku li deştek piçûk ava bûye. Nehîyeke piçûk û şerîn e, çem di nav re derbas dibe. Lî iro ew jî wek her gund û bajarekî Kurdistanê, gelek birîndar e, derbêñ giran xwarine, talan bûye, bê xwedî û xwedîkirin maye. Xelk li nav Xelîfan diçin, têñ. Roj bejnete bilind bûye. Gava em ji Xelîfan dubûhurin du rî dikevin pêşîya me ku yek diçê Şeqlawâ û piştre Hewlêrê, ya din jî diçê Silêmaniye. Em berê xwe didin ser rîka Hewlêrê. Deşta me zû xelas dibe, mintiqek nîv çiayî derdikeve

pêşîya me. Em têñ di ber gundekî re derbas dibin ku li ser milê rastê ye. Li ser milê çepê jî hin avayîyen resmî yên wêrân û talankirî hene. Şofêrê me bahs dike ku ev gundê Umer Axayê Sûrçî ye. Umer Axa, xwedan eşîrek mezin e ku cahşê hukumetê bûye; di jiyana xwe de tu caran nebûye hevalê şoresh, her bi hukumetê ve maye. Loma jî gundêñ nav esîra wî jî alî rejim ve nehatine hilweşandin. Di vê serîhildana dawiyê de jî esîra Sûrçîyan tevi serîhildanê nebûye. A nuha, têkiliyên wî him bi hukumetê re, him jî bi serokên partiyen Kurdan re hene. Eşîrek gelek mezin û xurt e. Yekî carekê jî me re bahs kir ku li dor 500 gundêñ Sûrçîyan hene. Esîr jî eşîren Behdînan

ê bi nav û deng Alî Herîrî bû. Dema destpêkê bû paytextê mîrên Soran jî. Herîr bi xwe Soran e. Lî hudûdê Behdînan û Soran tê hesabê.

Em ji Herîrê derbas dibin, pişti deh pazde degan Çiyayê Sefin ê bilind û bi darüber xemilandî derdikeve pêşîya me. Şeqlawâ ji alî nîzar ve pala xwe daye çiyayê Sefinê, di nav hêşinayıya daristanê de wenda bûye. Çiyakî jî wî çiyayî gelek nîzimtir ê ku navê wî Sorik e, nîvçeyî ketiye pêşîya Şeqlawâ, hin jî bajêr di piş xwe de veşartîye.

Em têñ li ber otela Midya Palasê

silavê li wan dike û bi nézikayike zêde li halê wan dipirse. Du rojnamevanen Ewrûpi jî li salonê ne, misêwa risman dikêşin. Pirtirin jî yên Mesûd Barzanî û Celal Talabanî...

Gava çavê Celal Talabanî bi me dikeve, çavêñ wî diçirûsin, bi kenekî geş ber bi me ve tê, xwiya ye qet texmîn nedîkir ku di demek wiha de me li vê derê bibîne, em bixérhatinê li hev dikin. Endamê Mekteba Siyasi ya PDK Selîm Soran li rex me ye, dixwaze me bi wî bide naskirin. Jê re dibêje "Tu hevalan dinası?" Xwiya ye pir li hesabê wî nayê. Hema di cih de bersiva wî

welatiyên din di wextê xwe de hatine havînên xwe li van deran derbas kîrine. Lî iro, pêjna tûrstan nayê. Herder meqerên pêşmergan e. Herkes çekdar e, peyati yan bi makinan diçin û têñ. Qasi em pê hesiyan, 136 meqerên pêşmergan li Şeqlawâ hene. Bes yên Yekîtiyê li gor agahdariya wan di ser 50'yi re ne. Yek jî meqeran jî yê "Millî Turkmen Partisi" ye ku serokê wan ajanê Mi'Ta Tîrkan, Muzaffer Aslan e. Pirbûna meqeran ne elametê başbûnê, lê elametê neréküpêkiyê û anarşiyekê ye.

## Civîna li Hewlêrê rojekê dajo

Berêvarê, hîn em li Şeqlawâ ne, xeberek tê ku heyeta guftûgoyan ji Hewlêrê paşde vegeriyate. Em tê diçihîjin ku heyet çûye Hewlêrê; heyeta hukumetê jî hatiye, civînek 3-4 saetan bi hev re kirine, paşê heyeta hukumetê gotiye ku wê vegerin, Bexdayê, divê ew jî bêñ Bexdayê û civînên guftûgoyan li Bexdayê dewam bikin. Di heyeta hukumetê de İzzet İbrahim, Tarık Azîz, Hasan Ali Mecîd hebûne. Hasan Ali Mecîd ew kes e ku di wextê xwe de bîyara avêtina çekên kîmyayî ya ser Helebçê dabû. Loma di nav xelkê Kurdistanê de navê wî bûye Alî Kîmyâvi.

Evarê di riya xwe ya berê re em dizivirin Rewanduzê.

Heyeta guftûgoyan, di herdu rôjîn dawiyê de, haziriya xwe û cûna Bexdayê dike. Di vê navberê de em jî lez dîkin ku serok û berpirsîn hêzên siyasi beri cûna Bexdayê bibînin.

Di 8'ê Tîrmehê de em diçin, li Serdawê Mesûd Barzanî dibînim, her wê rojê em vedigerin Şeqlawâ, Samî Abdurrehman, Dr. Mahmûd Osman û hin ji berpirsyarêni Yekîtiyê dibînin. Fîrsenda ditina Celal Talabanî çêne-be. Sibehî wê heyet biçê Baxdayê, di haziriya wê de ye.

Roja din di nehê mehê de heyet bi rî dikeve, diçê Bexdayê. Em jî diçin meqerê merkezî yê Partiya Komünist a Iraqê, Azîz Muhammed û Kerim Ahmed dibînin.

Di van dîtinêñ xwe de bi hemû partîyan re bi dûr û dirêjî em li ser rewşa Kurdistanî Iraqê, li ser guftûgoyan û rojîn pêş, li ser rewş û guhertina dînyayê û herêmê û li ser rewşa hemû Kurdistanî dipeyivin. Ew, agahdariyan didin me, dîtinêñ xwe pêşkêş dike, em jî dîtinêñ xwe pêşkêşî wan dike. Ez naxwazim li vir serê wê bêşînim, yeko-yeko bahsa van civînê û axaftinan bikim. Çimki gelek caran wê tekrar di wan de çêbibin. Lî dixwazim bi tevayî behsa guftûgoyan, tarixa wan û çawa berpêş hatine behsa wan bikim. Iro di ci qonaxê de ne, li ser wê rawestim ku kêm zêde di hemû civînê me de li ser wan hatin rawestandin.

## Serîhildan û Teklîfa Guftûgoyan ji alî Hukumetê ve

Serîhildana vê dawiyê li Kurdistanî Iraqê cara pêşin li Ranyayê dest pê kir. Pişti ku nêzî 300 pêşmerge li der û dora Ranyayê xuya bûn, xelkê sivil ê Ranyayê di 3'ye Adarê de serî hilda. Pêşmergan jî xwe gihandin dor



Serokatiya Cephê di civînekê de: Ji milê çepê ber bi rastê ve; Mihemed Sabir, Fuad Masûm, Samî Abdurrehman, Mesûd Barzanî. (Foto: Armanç)

e. Di hudûdê Soran de ye.

Avayîyen milê çepê berê yên bingehêki eskerî bûne. Kampek esîran jî di nav de bûye û wexta şerî Iran û Iraq, êsîren Iranî tê de bûne. Pişti şer rawestandinê, di veguhastina esîran de, ew teslimî Iranî bûne. Dema serîhildanê jî hemû avayî hatine hilweşandin û talankirin. Niha warekî wêrân ê xirûxalî ye.

## Xanzad; Xwişka Mirê Soran

Ku em vê mintiqâ nîvçiyayî xelas dîkin, em dikevin deşta Herîrê. Rê de deşte re di rex çiyayî Herîrê re derbas dibe. Berî Herîrê em rastî heykeleki têñ ku di çiyê de hatiye kolan. Mezin e, ji dûr ve xwiya dike. Şofêr dibêje ev heykelê Xanzadê (xuşka mîreki Soran) ye. Wê bi xwe rîsmê xwe di zinare bin çiyayî Herîrê de daye kolan. Xwiya ye Xanzad jîyanek gelek rengin û balkêş jiyaye. Heta piştre li Şeqlawâ li nik kitêbîfîroşekî, min kîtebek bi navê "Şewêk le jîyan Xanzad" (Şevek ji Jîyan Xanzadê) dît ku piyes bû. Hinan ji min re gotin ku ev piyes bi Kurdi di televizyonâ Iraqê de hatiye leyîstin, bûye tiyatroya filmê vê tiyatroyê yê videoyê jî heye.

Pişti çend degan em dikevin nav qezâ Herîrê. Herîr avayîyek kevnare ye, berê Gundû bûne. Gundû şairê Kur-

dadikevin, ku niha ne otel e, lê meqerê Partiya Demokrat a Kurdistanî Iraqê yê liqî duduyan e.

Berpirsyarêni liq Mamoste Mele Mehmed û Umer Osman in. Bixérhatinê li me dîkin, em diçin salona rûniştînê. Cûnûhatin û boşahiyek heye. Haziriya kombûn û cûna heyeta Kurdistanî tê kirin.

## Serokêñ Kurdan hemû li hev civîyane

Gelek di ser hatina me re naçe, endamên heyet têñ otelê. Di demek kin de hemû berpirsyarêni siyasi yên partîyen Kurdan li wir peyda dîbin: Mesûd Barzanî, Nêçîrvan Barzanî, Ali Abdullâh, Habîb Kerîm, Hisyar Zêbarî û gelek nas û dostîn din ji PDK. Dr. Mahmûd Osman, Qadir Cabbarî, Adnan Muffî û hinêñ din ji Partiya Sosyalist. Samî Abdurrahman û hinêñ din ji Partiya Demokrat a Gelê Kurdistanî, Qadir Azîzji ji Partiya Zahmetkêşan, Azîz Muhammed, Kerîm Ehmed û hinêñ din ji Partiya Komünist. Wekî din jî gelek eşraf, amîrhêz û berpirsîn siyasi li wê derê ne.

Di navberê re Celal Talabanî ji bi Dr. Fuad Mahsûm, Kemal Fuad û hinêñ din re dikeve hundir. Li ser xwe ye, devê wî bi ken e, şen û kîfxwes xwiya dike. Bi her kesi re yeko-yeko diaixe,

dide: "Çon nanasim, axir emane biraderî qedîmî xoman in" (Çewa nanasim, axir ev biraderen kevin ê me bi xwe ne). Bi vê peyvî re em hemû bi hev re diken.

Em pişte guftûgoyan ji Celal Talabanî dîkin. Dide xwiyakirin ku ji Sedam gelek bê hêvî ye, wê guftûgo zû bi zû bi ser nekevin. Piştre em pişte cûna wî ya Tîrkiyê û civînê dipesinîne. Dide xwiyakirin ku gelek kes dîtine, bi rojnamevanan re rûniştîne, di civînê de raporek li ser rewşa Kurdistanî xwendiyê û di vî karî de gelek serkeftî bûye. Çentê xwe vedike, hin resmîn xwe yên ji vê civîn û gerrê nişanî me dide. Bi Willy Brand, Erdal İnonu û hinêñ din re ye. Kêfîxeşîya wî di risman de jî diyar e.

Pişti demekê civat radibe bi konvoyeke mezin ber bi Hewlêrê ve bi rî dikeve. Em jî pişti wan diçin li súka Şeqlawâ digerin û hin nas û dostan ziyyaret dîkin.

Şeqlawâ nehiyek tûristik a şerîn e ku di nav daran de wenda buye. Li gor herêmîn din ên Kurdistanî hênik e. Ciyekî zozan e. Ne pir mezin e. Du otêlîn mezin ên tûristik tê hene. Lî nuha yek meqerê Yekîtiyê, ya din jî yê Partîyê ye. Xuya ye ev der, zêdetir ciyê turistên Ereb buye. Kuveytî û hin

# Kurdistana Iraqê

## yên n "na"

û nav bajêr. Şer du rojan ajot, şerekî xwinawî bû. Di pêncê Adarê de, esker û emn vekişa, bazda, Ranya hat rizgarkirin.

Di 8'ê mehê de xelkê Silêmaniye serî hilda, piştre hin pêşmergan xwe gîhandin bajêr. Lé bi serihildaneke spontan ji emnê (muxaberatê) gelek kes hatin kuştin, esker teslim bûn, serokên esker û emnê yên mezin bazdan, ên mayî teslim bûn. Xelkê esker nekuştin, lê nêzî 850 casusen istifxaratê hatin kuştin. Silêmanî rizgar bû

Di 9'ê Adarê de, xelkê Koyê û Şeqlawayê serî hilden, bêyî şerekî xwinawî ev cîh rizgar bûn.

Di 11'ê Adarê de Hewlêriyan se-rihilden, bajar di çar seetan de rizgar kirin. serokên hukumetê bazdan, yên mayî teslim bûn.

Beri Hewlerê di 10'ê mehê de Rewanduz, Diyana û qeza Sidiq rizgar bûn. Li wan deran jî tu berxwedan a leşkerî çenebû, hemû teslim bûn.

Di 13'ê Adarê de Akre, Berderê U Amedîye rizgar bûn. Di 14'ê Adarê de Zaxo û Dihok ji alî serihildana xelkê ve hatin rizgarkirin.

20'ê Adarê yanî şeva Newrozê bi hezaran pêşmerge û ji 50.000'î zêdetir xelkê sivil wek pêlîn behrê ber bi Kerkükê ve herîkin, di 21'ê Adarê de gava roja sibeha Newrozê hilat, Kerkük bi piranî hatibû rizgarkirin. Şerî herî giran li herêma şirketa petrolê hatibû kirin. Gava ew der şikya û cîh ket destê pêşmergan, derêne din ji muqaweme sist kirin. Serokên emn û eskeri û idarî yên mezin her tişt di cîh de hiştin û reviyan. Lé li dora Kerkükê ji alî Müsilî ve şer tu carî nesekîn, her dewam kir.

### Mukerrem Talabanî teklifa lihevhatinê tîne Kurdistanê

Hê destpêka biserketina serihil-danê bû, Mukerrem Talabanî, ku wezîr e di hukumeta Iraqi de û heta niha ci teklîfîn rejima Iraqi bûne wî bi xwe anîne ji Kurdan re, hat Kurdistanê, Celal Talabanî û Mesud Barzanî dîtin, da diyarkirin ku Saddam Husên teknîfa guftûgo û lihevhatinê li Kurdan dike.

"Sadam Husên dibêje" got Mukerrem Talabanî "ji cudakirina Kurdistanê pê ve Kurd ci bixwazin em hazirin bi wan re guftûgo bikin". Serokên Kurdan fikirin ku teklîf, teklîfeke baş bû. Kurdan ji xwe cudadarin û serxwebûna Kurdistanê nedîxwestin, ev yek di rewşa iro ya herêmî û cîhanî de mumkun nedidîtin. Madem ku Saddam, ji vê pê ve ji her tiştî re hazir bû, idî wan ci dixwest.

Lê baweriya wan bi Saddam nedihat, têr iqna nedîbûn ku Saddam ji dil wê hazir be ku pirsa otonomiyek rastir yan cumhuriyetek federalî bi wan re munaqeşe bike û qebûl bike. Loma, xwiya bû tenê bi hatina Mukerrem Talabanî dilê wan li cîh rûnenîst, xwestin heyetekê bişinin Bexdayê, ew raste rast ji devê hukumetê û ji ye Saddam teklîfe bibîhîzin.

Heyetek ji du kesan; endamê Mek-teba Siyasi ya PDK Fazil Mutnî û ye YNK Ferîdûn cûn Bexdayê û vegeri-

yan hatin, gotin; rast e hukumetê ji me re gotiye ku, em hazir in rûnin, her tiştî bi Kurdan re munaqeşe bikin û pîrsâ Kurdi ji binî safi bikin.

### Li Kurdistanê bûyer wek babelîskê diguherin

Ev cûn û hatin di demek kurt de pêk hatin, lê bûyerên Iraqê û bi taybeti yên Kurdistanê Iraqê ji van jî zütir dihatin guhertin. Hê heyeta du kesan ne gihaştibû Bexdayê, Saddam ordî ji başûrê Iraqê gihad Kurdistanê.

Êrişa ser bajarê Kurdistanê dest pê kiribû jî. Heyet li Bexdayê bû, şerekî xwinawî li Kerkükê dibû. Li gor dihat gotin gava êrişa ser Kurdistanê dest pê kir, ji bili pêşmergen kevn tu kesen din şer nekirin. Çekdarên serokcaşan, ku di serihildanê de rolek esasî listibûn, niha şer nedikirin vedi-kişiyen; çekên giran li cîh dihiştin, çekên sivik davêtin. Loma pêşmergen esîli li hember dijimin di parastina bajaran de bi tenê mabûn û qeweta wan têra parastina bajaran nedikir. Li gor Celal Talabanî digot, di şerî Kerkükê de bes ji YNK 1600 pêşmerge hâtilibûn şehîdkirin. Ordiya Saddam bi tank û topan, bi helikopteran êriş dibir ser xelkê sivil û bajêr. Xani, apartman û semt bi topan hildiweşandin. Dengê wê yekê di nav milet de belav bû ku Saddam çekên kimyayı bi kar anîye.

Di encama van û geleb tiştîn din de, xelkê sivil û Kerkükê, bi carekê rabû ji bajêr derket û berê xwe da ciyan, pêşmerge nema karibû bajêr biparêze û di demek kin de di 27'ê Adarê de Kerkük ket destê dijimin. Ketina Kerkükê, bi awakî xerab tesir li gelê Kurdistanê Iraqê kir, gel hemû bajar û warêne din terk kir. Wek lehiyekî berê xwe da ciyayen Kurdistanê, ser hudûdên Iran û Tirkîyê. Hewlê di 1'ê Nisanê de, Silêmanî di 4'ê Nisanê de ket destê dijimin. Pêşmerge paşde vekişa, heta qeza Selahadin ji berda, lê berxwedana esasî hew karibû li ciyayê Sefîn ên pişte Şeqlawa saz bike. Di wan ciyayen de ordiya Saddam hat rawestandin. Li herêma Dihok û Zaxoyê, ji xwe qet erdêne rizgarkirin nema.

Gava heyet ji Bexdayê vegeriya Kurdistanê, rewşa Kurdistanê 180 derce bi vî awayî hatibû guhertin.

Piştî heyeta du kesan ji Bexdayê vegeriya, cara pêşin Cepha Kurdistanê Iraqê resmî civiya ku li ser pêşniyara hukumeta Iraqi bîryarekê bide: Kurdistan vala bûbû. Du milyon insan bi çol û ciya ketibûn. Serma bû, li ciyan berf dihat, xwarin û derman tûnebûn, êrişek hov û dirindane li pey wan bû, cîh û waren ku wan vala dikirin ji alî ordiya Ereb ve dihat talan û wêrankirin. Ji serma, birçibûn, nexweşî, westan û tirsê rojê du hezar kes dimirin. Nêzî tevaya miriyan zarok bûn, jîn bûn, kal û pîr bûn. Tirkîyê deriyê stârê li wan venedikir, kontrola li ser hudûdên Iran, bûbû bendek li ber pingara lehiya insanan, bi kilometran însan li pey hev qor bûbûn. Hawar û gaziya Kurdan li dînyayê olan dida, televîzyon û rojnamen cîhanî dinya bi agahdariyê ji Kurdistanê bombaran dikirin, lê ne kes bi gazî û hawara Kurdan ve dihat, ne hukumetekê denge xwe dikir, ne jî tu alîkarî ji Kurdan re dihat.

Serokên Kurdan fikirin: Gelo ev ci bû, ma dikir wek Ermeniyan bê serê Kurdan. Xwiya bû, li ber çavê hemû cîhanê bi milyonan insan wê bimirana, Kurdistan wê wek Ermenistanê bîbûya kavil. Wexta fikirandin û munaqeş dûr û direj û bi aqle selîm nemabû.

Divê biryar bihata dayîn.

### Heyeta Kurdan diçe Bexdayê

Cepha Kurdistanê Iraqê di cîh de biryar da: Di serokatiya Celal Talabanî de, heyetek ji Samî Abdurrahman, Resûl Mamend û Neçîrvan Barzanî pêkhatî ber bi Bexdayê bi rî ket.

Wan hê biryara xwe didan, bê-dengiye cîhanê ji çiriya, protesto ji hukumet û dezgehen resmî û nersemî yên Ewrûpayê bilind bûn. Xaça Sor, rîxistinê mirovayî yên cîhanî, hukumetan, dezgehen doktoran û yên din dest pê kirin alîkarîya xwarin, derman, çadır, betanî û kîncan rîkîrin ji Kurdan re. Lé wilo li Kurdan hatibû ku, alîkarî ne bi rojan lê diviya bi see-tan bigîştâ wan, roj û hette pirereng bûn.

Ji ber vê yekê ji destpêkirina protesto û alîkarîyan, biryara Cepha Kurdistanê Iraqê neguhart. Heyeta Resmî ya guftûgoyan cû Bexdayê, Saddam dît, endamên heyetê yeko-yeke Saddam maçı kirin, guftûgoyan

bûl bikin. Ji beyanê vir de 20 sal derbas bûne, divê ev dem jî bê hesabkirin û pêşketin tê de bîn qebûlkirin. Em hazir in ji beyana 11'ê Adarê zêdetir bidin.


Heyetek digot: Me divê demokrasî û azadiyek fireh li Iraqê hebe. Saddam peyva wan di devê wan de dibirî, digot:

-Lê çawa! Hin berî ku hûn bêjin em bi xwe hazır in ku demokrasiyek heqîqî binin Iraqê. Ne ku niha, hê ji berê de hukumeta me li ser vê meselê rawes-tiyaye. Berî Şerî Xelîcê, ji bo bicîh-kirina demokrasiyê li Iraqê me bi dûr û direjî planek amade kiribû. Lé şer bi ser me de hat, nehiş em vê plana xwe li dar xin. Lê iro şer xelas bûye, em di-fikirin û hazır in ku demokrasiyek ras-tin bînî seranserî welêt.

Heyeta Kurdan digot ci, Saddam digot rast e, wek we ye û ji daxwazên wan zêdetir ji pêşkêş dikir.

Nexwe idî Kurdan ci dixwest? Ji xwe tiştî ku wan dixwest jî ev bû.

"Lê" digot Saddam "em naxwazin ji Kurdan bes bi terefekî re rûnin. Ji



Gava meriv ji Rewanduzê ber bi Şeqlawa bi rî dikeve, divê meriv di Gelîyê Alî Begê re derbas bibe. Gelîyê Alî Begê gelîyekî kûr û teng û asê û direj e. Heta niha min gelîyekî wiha bi heybet li tu derê nedîtiye. Çemekî zirav di gelî re diherike, ku zivistan û buharan ne wiha zirav û şin û nazenin e. (Foto: Armanç)

dest pê kir.

Erê guftûgo resmî bûn, lê hemû civîn, ci bi endamên hukumet re ci jî bi Saddam re li ser esasen çarçevênen giştî dimesyan û şîfahî bûn. Zebt nedîhatin girtin. Pirs bi berbiçavî, xal bi xal nedîhatin munaqeşkirin. Li ser çerçewa otonomiyê û demokrasiyê dihat axafîtin.

### Heyeta Kurdan ci dixwest Saddam digot "baş e!"

Heyetek digot, Kurd tiştîkî na-xwazin, ji bili otonomiyek heqîqî. Saddam li wan vedigerand:

-Helbet, helbet ji xwe ne hewce ye em bi dûr û direjî munaqeşa vê yekê bikin. Beyana 11'ê Adarê berî bist salan di navbera me de hatiye imzekerin. Yê ku ew beyan qebûl kiriye, ez bi xwe me. Em iro hazir in ku beyana 11'ê Adarê bi guhertinek ber bi pêş de qe-

ber ku me biryar daye, em pirsa Kurdi vê carê ji binî ve, bi her awayî safi bikin, em dixwazin bi hemû terefan re yanî bi Cephê re rûnin û divê de dereca herî bilind de guftûgo bimesin". Loma, dîtina Celal Talabanî ji bo Saddam Hüsnîne bes bû. Wi dixwest ew rûbirû bi Mesud Barzanî re ji rûnê.

Kurd fikirin ku ev daxwaz jî tiştekî maqûl e. Him ji bo vê yekê, him ji ji bo xwe amadekirina ji bo guftûgoyan, heyetek biryar da ku vegere Kurdistanê.

Gava heyeta Kurdan vegeriya Kurdistanê, li Bexdayê ci kirine, ci nekirin hemû neqîl kiriye. Cepha Kurdistanê Iraqê rûniştiyete projek li ser qanûna otonomiyê, li ser mesela demokrasiyê û li ser normalizekirin û avakirina Kurdistanê.

pêk hatibû. Di destpêkê de Mesûd Barzanî bi xwe û PDK zêde dil nedikirin ku Mesûd Barzanî biçe Bexdayê. Lé hat gotin ku ji bo selametiya biser-ke-tina guftugoyan divê ew biçe. Di encamê de, heyeta Cepha Kurdistanê Iraqê, proja amadekirî girt û çû Bexdayê.

### Guftûgo dirêj dajon

Guftûgoyen Bexdayê yên vê carê 42 rojan ajotin. Rayagisti ya cihanî û ya Kurd tu carî hay jê nebûn ku di van 42 rojan de ci hatin gotin, ci hatin munaqeşkirin û ci hatin qebûlkirin. Car bi car di riya televizyon û rojnamen Iraqê re hin Beyanen Mesûd Barzanî derdiketin, ku behsa bawer-pêanîna bi Saddam dikir, bâhsa wê yekê dikir ku heyeta Kurdan doza tu garantiyek navetewi li Iraqê nekiriye. "Çimki" gotibû Mesûd Barzanî "garantiya esasî baweriya her du alîyan bi hevdû re ye".

Heyet dereng diket; venedigeriya Kurdistanê di navbereke re ciye otela wan hat guhertin. Heta demekî di rojnamen Ewrûpa de derket ku, hukumet Saddam dest daniye ser heyeta Kurdan. Lé piştî heyet xwiya bû, derket pêşberî rojnamevanan. Mesûd digot:

-Di gelek tiştan de me li hev kire. Hin noxtên piçûk mane. Em hêvî dikin ku wê di demek kurt de peymana otonomiyê bê imzekirin.

Di raya giştî û ya Kurdan de di-hat gotin ku Mesûd Barzanî xeber rîkîriye pey Celal Talabanî ku were Bexdayê ku her çend nuxten mayî jî bîn munaqeşkirin û peyman bê imzekirin. Lé li alî din dihat gotin ku Celal Talabanî jî daxwaz li Mesûd Barzanî kiriye ku vegere Kurdistanê, li hev rûnin, neticen guftûgoyan muzakere bikin. Hê beyanen Mesûd Barzanî derdiketin ku li Bexdayê li hîviya Celal Talabanî ye, Celal Talabanî cû İstan-bolê, civîna Enternasyonal Sosyalist. Piştî civîn jî li wir mudetekî ma. Reîscumhûrê Tirkîyê Turgut Ozal, Erdal İnonu û Suleyman Demîrel zi-yaret kiri. Çend civîn bi rojnamevanan re kiri. Sefaretîn hin welatên Ewrû-payê zi-yaret kiri, heta hat behskirin ku nerehetiyek wî heye, çûye li ne-xweşxana Amerika tedâwi dibe. Bi vî awayî rojîn Celal Talabanî yên li Tirkîyê zêde bûn. Di vê navberê de Mesûd Barzanî jî Bexdayê vegeriya Kurdistanê. Piştî Celal Talabanî ji Tirkîyê vegeriya. Dr. Mahmûd Osman û Azîz Muhammed jî ji dervayî welêt veg-erîna Kurdistanê.

### Saddam hemû sozên xwe jîbirkirine

Cepha Kurdistanê Iraqê li hev ci-viya, encamên guftûgoyan muzakere kiri.

Xuya bû ku hukumeta Iraqê ew soz û peymanen ku di destpêkê de da-bûn Kurdan, hemû ji bîr kiri; li hem-ber proja Cepha Kurdistanê Iraqê, wê jî projek pêşniyar kiriye ku tu têkiliya wê bi dayina otonomiyê, bi avakirina demokrasiyê û normalizekirin û veavakirina Kurdistanê nîne.

Di guftûgoyan de mesela demokrasiyê û ya hudûdê otonomiyê neha-tibû zelal kiri. Hukumetê qebûl neki-ribû ku Kerkük, Sîncar, Xan-e-qîn û Mendîl têkevin nav hudûdên otonomiyê. Hukumetê, iddia dikir ku piraniya rûniştiyên van deran ne Kurd lê Ereb in.

Cimki berî sê salan di 1988'an de hukumeta Iraqê, qanûnek derxistibû

# Cîrok

Ji wêjeya  
Bûlgarî


Wergêr:  
Zagrosê Haco

Careke din xwe ji çiyê berda xwar. Zirav bûbû; hingî çeliyên wê ew mijtibûn, çavên wê yên birçî diçurisin... Heke carna nêçirek dikir ji, lê birçibûnê her û her ew diguvaşt; nêçir li xwe û li çeliyên xwe leva dikir.

Şeş çeliyên wê hebûn; zû mezin dibûn, kurbûna wan zortir dibû, têr nedibûn. Carênu ku demeke dirêj li benda diya xwe diman û ji bêhîntengi ji qula xwe derdiketin, pir bûn. Diya wan ew bi hestûki ji hestûyen hespekî mijûl dikirin û diçû li xwarinê digereha. Xwe li çemên bi şek dida, dida nav deviyên asê. Guh bi ser çolê de pêjin dikirin... Nêzikî gund axur hebûn û ne dûr, li ber pala çiyê kerîyen pez diçerîyan.

Cara pêşî roj li nîvro bû, hêris kir, berxek ji stukurê girt û avête ser pişta xwe. Tîrs kete nav kerî, se li pey ketin, rê ji her du alîyan ve lê teng kirin. Kêlikek neçû, şivan jî rabûn û li san deng kirin: "Gur ! Gur !".

Dêlegurê fersenda xwe



dît, bi lez û bez xwe gihande serê çiyê. Xwe li dereke vala girt; xwina germ a xweş hîn bi dora devê wê ve bû. Di xwe de pingeha û bi kîn zûriya... Gelek carênu din ji bi vî awayî bi ser de çûbûn. Wê xwe bi kişenê nêzikî keçiyên pez dikir, bi birçibûn û hêviyan ve demekî dirêj li pişt çiloyekî dima. Lê san ji dûr ve bîhna wê dikir û şivan jî radibûn, şiyar di-

man. İşev ji li keviya deviyê bû. Roj ji mêt ve çûbû ava. Dûrbûnê dengê zengileki, yan marêna mihekê li hev vedigerand. Se razayî bûn, bayekî nerm ji çolê ber bi aliyê deviyê de dihat, nedîhişt ku se bi nêzikbûna gur bihesin. Rabû ji deviyê derket, bi ser gova pez de cû. Hingî mih, berx û bîzin nêzikî wê hebûn, êdi haya wê

şevê. Dikaribû xwe bi rê de li her derî dirêj ke, lê gomannen wê yên li ser çeliyên wê nedîhiştin ku ew bi hêsanî xwe bi dest mirinê de berde. Dixwest cara dawiyê wan bibîne û bi devkêni wan yên biçük bilize. Çeliyan pêjna hatina wê kirin, baz dan pêşiyê.. digirin, laşken xwe di ser laşê wê re dibirin û tanin, hêviya ku xwarinê bide wan jê dikirin. Lê dê-

ku ji bilî Kurdên sunnî, hemû Kurdên Êzidî, Fileh û Tirkmanên Iraqê û yên Kurdistanê Ereb qebûl kîribûn. Digo-tin ev hemû Ereb in.

Mesela normalîzekirina Kurdistanê, yanî vegera Kurdan ser cih û warênu xwe, avakirina gund û bajaran, bes ji bo herêmén ku diket nav otonomiye hatibû qebûlkirin. "Lê" gotibû hukumetê, "herêmén ji alî ewleyî û stratejik ve girîng devîne di nav de bin". Ev "lê" dikaribû bîhata wê manê ku, divê veger ji bo ser hidûdê Sûriyê, Tirkiyê û Iranê çenebe û ev der ji nuh ve ava nebin. Xaneqin û Mendelî, him li ser hidûdê Iranê bûn, him jî nêzî paytext (Bexdayê) bûn, ji alî ewleyî ve, nedibû Kurdên Feyli vegeriyanâ van herêman, divê kes venegeriyanâ herêmén petrolê. Mana xwe, bi "lê" yekê mesela normalîzekirina Kurdistanê, dihat pûçkirin û dibû cihê pêkemînê. A din hukumetê, herêmén Kurdi yên ne di nav otonomiye de nexistibûn çarçeva normalîzekirin. Di esasî de pirtirîn ji di van cihan de Kurd hatibûn talankirin, wêrankirin û mihacirkirin. Erebêñ şî û yên din li ser zevî û gundûn wan hatibûn bîcikirin.

Hukumetê qebûl kîribû ku qanûneke otonomiye derkeve, lê divê walî û qeymeqamîn herêma otonomiye bi merkezê ve girêdayibûna, emîn wek berê bi reisecumur ve girêdayibûna, ji bo parastina hidûdan ordî li Kurdistanê bîmâna, ji bo parastina ewleyî, iştîkrar û aramiye pêşmerge bîmâna, lê bi wezareta hundurîn a hukumetê merkezî ve bîhatana girêdan.

Saddam hin şert  
danibûn ber Kurdan

Piştî van hemûyan hukumetê hin

# Mak

ji tiştekî nema. Xwe da hev, da xwe ji ser diwêr bavêje û...bi ser pişta xwe de ket, çaxê ku ji nişkê ve agirek vêket û di laşê wê re bihûrt. Rabû, baz da; Lingekî wê yê paş di ber re dixişişti.

Caxê bi xirxirandin giha qula xwe, tew bûbû nîvê

legurê xwe li ser erdê dirêj kir, ji bona şahiya dawiyê hêz di xwe de ne-didit. Zarok bi xeyd zûrin û hatinê. Gurê serê xwe hilda û lingê xwe yê paşiyê ku bi tayekî zirav ji çerm bi laşê wê ve mabû, gez kir û avêt ber çeliikeki xwe. Wi, xwîn alîst û ling revand. Kêlikek nebihûrt, çeliikan ji wî lingi bi tenê hestû hiştin.

Dêlegur dirêjkirî bû, bi windabûna vê jîna tîji hêrişen bi mîranî, tîji şerîn ne li gor hev û bi hejekirina çeliikeki xwe dihesiya. Gomanen wê yên dawi li ser wan bûn. Diviyabû xwarinê ji wan re peyda bike, wan têr bike, dilkêni wan bi cih ke. Heye ku roviyek wan bibîne, wan bikuje. Çeliiken wê hê li dora hestû diçün û dihatin; dikûzin... Gurê xwe kişkişand cem çeliikan, cihê bi xwîn ji lingê xwe xiste devkêni wan.

Edî serê xwe danî û çavênu xwe girtin... Stêrên ku di gelek şevan de rînasen wê bûn, korî bûbûn... Bayê ku carê ji dûr ve bîhna nêçirên wê jê re tanî, bê pêjin bû... Jin hemû ku mala wê ya bê sinor bû, tarî bûbû û di pêlén kûrbûnê de winda bûbû. Di vê taristanê de dirêjkirî bû; bi xweşî... bi xweşî dihesiya ku laşê wê parce parce diçe devkêni zarokên wê û jîna wê dihîrike nav jîna wan.

dikare li ser navê wan, hemû guftûgoyan bîmesine.

Jê pêştir vê carê di heyeta Kurdan de hin pisporêni di warê huquq, zimanê Erebî û hin meselên din de jî hebûn.

Celal Talabanî sê-çar rojan li Bexdayê ma, carek din bi Saddam Husêni re rûnişt û vegeriya Kurdistanê. Piştî çend rojan jî derket gerra xwe ya Ewrûpa ya ku destpêka wê îngilttere bû.

Heta em ji Kurdistanê vegeriyan jî ku 15 roj di ser guftûgoyan re buhû bûn, tu agahdariyên li ser lihev-hatînek tevayî negîheştin raya gitî. Bes di hevditinek me de ya bi Celal Talabanî re piştî ku ew ji Bexdayê vegeriya bû, xeberek hat ku heyeta Kurd û hukumetê li ser du nuxtan li hev kîrine, lê nuxtan mayîn hîn hemû di munâqşê de ne. Ew herdu nuxte ev bûn.

-Hukumetê mesela normalîzekirina Kurdistanê; vegera Kurdan ser cih û warênu xwe, paşde rakirina Ereban ji ser erdênu Kurdan, ci di herêma otonomiye de be, ci jî dervayî otonomiye be, qebûl kîriye.

-Ya duduyan jî hukumetê dev ji wê yekê berdaye ku bi imzakirina peymanê re radyoyen Kurdistan bê rawestandin. Li gor lihevkirin, heta rojnamen Kurdan dest bi weşanê bikin, wê radyo weşanê xwe bidominin.

Ji roja çuyina xwe ya Kurdistanê û heta vegera xwe, ev agahdarî bûn ku di derheq guftûgoyan de gîhaştibûn me. Loma jî dixwazim nîvîsa xwe ya li ser çirok û rewşa guftûgoyan li vir bibirim, cardin veggerim ser gera xwe ya li Kurdistanê, behsa wê yekê bikim ku me ci dîtin û ci bîhistin.

(Dom dike)

zeif nebûye. Ku ne iro be û ku ne Sadamî niha be em nikarin peymanek maqûl bi kesi re bidin imzakirin. Eger were û Saddam bikeve, yekî din têkeve şuna wî, wê wek Saddam ji dînayê ne tecritkirî be, wê ewqas ne rûreşkirî û bê dost be. Emê wek demen kevin li hember wî bê dost û heval û tecritkirî bîmînîn. Miletê me jî piştî van 30 salan, ewqas talan bûye, ewqas ji cih û warênu xwe hatiye rakirin, ewqas hatiye kuştin, idî taqet tê de nemaye. Hela vê şikestin û mihacirya dawî, bi temamî ew perîşan kîriye. Hema çawa be jî em peymanek bi Saddam re imze bikin, milet vegere ser warê xwe, bi cih bibe, rûyê aştiyê bibîne, nema koç bike, bê kuştin, ev jî iro ji bo me bes e.

Ditinek din jî hebû digot erê belki ev hemû kêm zêde rastiyêne me ne, lê şertê ku Saddam dide ber me, ne mumkun e refehi û aramîyê ji miletê me re bîne, rê nade ku miletê me bi dilrehetî vegere ser cih û warênu xwe, ne mumkun e ku baweriyekî di nav milet de peyda bike. Tişteku Saddam ji medixwaze ew e ku em û miletê me em hustiyê xwe dirêj kin ber kîra wî. Baş e, em guftûgoyan bi hukumetê re bîdomînîn, lê rewşa Saddam, ya miletê me û rewşa mewqîfî dînayê, dewletîn Ewrûpa li hemberî pirsa Kurdi û li hemberî rejima Saddam û bi taybetî şexsê Saddam ne di wê noxtê de ye ku em hemû şertên giran ên Saddam qebûl bikin. Dinya serê Saddam di-xwaze. İro Saddam nikare êrisê bîne ser me. Mutefikan soz dane ku Saddam êrisê bîne ser miletê Kurd, mutefik wê lêxin. Mutefik daxwaz dikin ku em jî êrisê nebin ser ordiya Saddam. Em ji xwe ne terefdarê wê yekê ne ku şer bikin. Miletê me, westiyeye,

perîşan û derbeder bûye. Naxwazeşer bike, lê bi sed hezaran pêşmerge û çekdarân me hene. Èris were jî em dikarin xwe biparêzin. Loma jî em zû bi zû hema rejim çi da me jî, em qebûl nekin. Em muhawele bikin ku peymanek maqûl imze bikin. Mafekî durust ji bo miletê xwe bi dest xin.

## Kurd projeke nuh amade dikin

Di encama munâqşê û çûnûhatînen qasî panzde rojan de, ev her du dîtin herçî hebûnê xwe parastin jî, gîhaştin wê yekê ku, pêşniyariya hukumetî ya guftûgoyen 42 rojan neyên qebûlkirin û imzakirin, ji dévlî ve Cephâ Kurdistanâ Iraqê projeyeke nuh hazır bike ku tê de asgarî hedêni li ser hemû meselên otonomiye, meselên hûdûd û yên demokrasiyê bîn danîn û bi vê projê û vî hedê asgarî ve heyet biçê Bexdayê, dest bi dewra duduyan ya guftûgoyan bike. Cephâ bi her 8 partî û hêzên xwe ve imze û qebûl kir ku eger ev hedê asgarî ji alî hukumetê ve bê qebûlkirin, bila peyman bê imzakirin, eger neyê qebûlkirin, bila neyê imzakirin.

Heyet di meha Tirmehê de ber bi Bexdayê bi rê ket. Di heyetê de Mesûd Barzanî, Celal Talabanî, Samî Abdurrahman, Dr. Mahmûd Osman, Fuad Mahsûm û hin berpirsiyaren din hebûn. Li gor biryara cephâ Celal Talabanî ne endamê heyetê bû. Lê ji bo du rojan wê bi heyetê re biçûna Bexdayê, bi hukumetê û Saddam Husêni re rûniştana, ji wan re bidana nişandan ku li ser guftûgoyan tu cihîfîkirin, di navbera partiyen cephê de nîne, bidana nişandan ku heyeta Kurda dest bi weşanê bikin, wê radyo weşanê xwe bidominin.

Ji roja çuyina xwe ya Kurdistanê

## XELASİ

pey zî Piran resay. Piran di Xelasî otobusi ra peye bi, 'enê şî ki Parqê Piranî di roso. Hewniya ki çi bihewnîyo! Parq beyntar ra hewa niyawo, ay daranê parqî ra yew zî nêmenda. Reisê Belediya Piranî, herinda parqî di dikanî daybî viraştî. Xelasî şas û mat mend, a gami nêzana se biko. Vera vera hêşê jey hame serey jey, şî yew qehwexane di ronişt. Pilotê qehwî ca di dey rî çay ardi (Piran di garsonî ra vanî "pilot"). Pilotî ra persa va:

-Ereba Qojigî key wardena?

Pilotî û yew-di mérđiman tê fek ra va:

-Se'eta yay boyli niya, kom goma ki mişterî yay temom bî ay wext wardona.

Qehwexane di pencera ver di yew Pirajmonij roniştebi. Ey û Xelasî yewnan dî, Pirajmonij werîş hame masey jey, destê yewnan tepîş şidêna, lewî pê ra şî, pê persay. Îno imbazê Xelasî yê mektebî bi. Roniştî tereqna, serrê mektebî ardî xu virî.

Xelasî kam gama ki yew Pirajmonij bidînî deyîra Husê Hajî hameynî jey virî:

Huso, Hajî barê xu wenawo,  
Terxanew Melekan di ronawo,  
Hus dişmenan rî ca verdawo.

Huso, bawî û dostan to rî vawo,  
To çakuçê xu piro dawo  
Leyro, leyro, Husê mi leyro!

Mist biyo binê emiraltî mudirî,  
Hus biyo şarê mezellî,  
Leyro, leyro, Husê mi leyro!

Huso, Mistê Bezi bêîman o,  
Tifingê mergî Husî ya nano.  
Leyro, leyro, Husê mi leyro!

Sebeb ci yo, ci yo, la çina wo?  
Vanî sebeb ina dela Leyla ya.  
Leyro, leyro, Husê mi leyro!....

Îna deyîri, telebeyî û gedeyeşa Xelasî ardi Xelasî virî. Da-hîrî serî ra ver, wîrdêkeya xu di ina deyîri zav gûştaritibî. Deyîri kişîşê Husê Hajî ser o vajiyaybî. Hewawo ki vanî, dewa Pirajmonî di semedo ki Husê Hajî cenîya Mistê Bezi dim a geyrawo, Mistî xeberi erşawita Husî ser, vato "Huso, fek cenîya mi ra vera di, nomusê mi mefîni bindê payon". Labrê Husî fek cenîya Mistî ra vera nêdawo. Tesliya Mistî kewta, yew şewa amnanî ya tarî di xu rut kero, tifingê xu giroto şîyo binê 'ezley Husî di xu netirnawo, pawito ki Hus kişta kiwo. Tanî wext te de şîyo, Hus û cenîya xu 'ezlî ser o rakewti. Verî cenîya Husî xu di şîya. Destê ja Husî ser o biyo, Husî destê ja nuskî dawo, vato "Tikê başta şo". Mistî pîzey xu di vato "Tam ercelê jey hamewo" û bineyna vinderto, hinî zanawo ki Hus zî xu di şîyo, surmey tifingê orîşî kay dawo, Husî ra nawo û hezey vay durî kewto. Şîyo keye ki cenîya xu Leyla zî bikişo. Labrê semedo ki vengê tifingê şîyo Leyla, Leyla keye ra remaya û gama ki Mist hamewo keye, a keye di nêbîya, cûka nişnawo ja bikişo.

V

Gamî teraqi ra pey Xelasî imbazê xwi yê Pirajmonijî ra xatir waşt, werîş şî dolmîşa Qojigî wenîş. Dolmîşa pirr bîbi. Piranî

miyan ra viyartî, Diziki ro veçiyay û pey di qelibna. Pey Diziki di yew xorû velg herî wenabi, dim a şînî. Xelasî xwi pîze di va "Îna aşma velgan, mazîyan û gezîyan a." Tikêna aver şî, dar û ber hasa, hinî dor-mar daristan bi. Hina zav darê şalbêri û mazêri, yew yew zî sewbîna darî hasaynî: simzêri, teyerî, qizbanêri, wersî. Dolmîşa tanîna ca şî, yew gome hasa. Vatişê rayanan gore yewek inî gomî di çinêbi, wayîran terk kerdi. Xelasî gome ra bineyna pey Doxan di. Rayanan ra persa, inî va ki Doxan yew mezra Qojigî ya. Xelasî fam kerd ki Qojigî nîzdî ya.

Zav te de nêsi, dolmîşa ki Xelasî te de bi Qojigî resay, dewi miyan ra viyarti, seracêr şî. Yew cenêka şikta jînî ver a bî, sitlan reydi aw berdînî Qojigî. Seracêr ki qediya, dolmîşa roy resay. Awa roy kuhoya zincarrini bî. Xu ra Qojigî ra hewniyayîşê kî di, ro hezey lîlikî beriqiyaynî. Dolmîşa ro ro ginay û bover kewti. Gama ki bover kewti, şoforî dolmîşi 'edilnay, heme kes peye bi. Lajê dostê pî Xelasî, Hajî Refoy zî Xelasî rey di bi. Xu ra Xelasî mêmâne jey bînî. Hajî Refoy destê xu derg kerd û durî ra kinarê roy di yew kerrewo berz ra tanî kafê surî Xelasî nawîtî, va:

-Hîri serrar ra ver, ay kafanê suran di, cendirmanê hukmatî û gerillayan şer kerd. Hukmatî teyaran, tifingan û topan reydi hîri partîzanî kişti.

Xelasî persa va:

-Ino kiştiş ra pey hukmatî ezet da şîma zî?

Hajî Refoy va:

-E. Oynî û xaxî ma vetî. Va "Ganî şîma qorucîyey bikî", ma ra yewekî qebul nêkerd.

Rayanan ra qorrî şî qumî ser o, qorrî şî kinarê çemî di herri ser o ronişti. Çind tenî zî şî tehretê xu girot, amey tahta nimajî ser o nimaj kerd. Xelasî dor-marî xwi ra hewniya, kişta çepa çemî di tanî bostanan kuho kerdiñî û bostanan miyan di tuyeri, xerebêri, kewçikdarî, vinêri, kewkibêri kî çim a kewtînî. Kişta bîn a roy di çend hebî cenî ver a yewbinan vindertîbî pey konîyan cirna belxulî kutînî. Yewna cenî nîzdî çemî di belxul vaydaynî. Fesa ja ja ser naya, kefiya ja mîr a besta bî. Xelasî ki fes û kofî û kefiya cenêki dî, dewa jey hamey jey virî. Cenîyanê dewa jey zî da-vîst serri ra ver fesi û kofîya şarînî xu ser naynî. Dim a cenîyan vera vera fes û kofîyê xu vîstîbî.

Xelasî tikêna durî ra hewniya, di hebi zî keynekî dî. Keyneka yew bostanî miyan di belxul şeli-qaynî, a bîni zî estori wenîştibî kerdiñî ki noverê roy kiwo. Hêdî hêdî nover kewti, dim a estora xu xar day û durî kewti, şî.

Rayanî goreba vîst deqîqan weyra vindertî û werîşti şî dekewti dolmîşi. Dolmîşa ver bi qayme şî, Hacî 'Îson ver ra viyarti, dekewti tanî hîran mîyan. Hîri pirr gewen bî, kişt û kinarê rayî dar-mêse bi. Daran miyan di gelek borîcêli, qoçikêri û dirrikêli bî. Panj-şes deqan ra pey dolmîşa vinderti, Xelasî û Hajî Refo peye bi.

Dolmîşa û rayanê bîni ki şî vinî bî, Xelasî û Hajî Refoy xu vîst hîgây telluyînî miyan. Hêga di gorjal û telluy bîni jînî ra şî hetana ki xu yew rezî resna. Dor-

marê rezî şîmîşa reydi perçînkerde bi. Kewtî rezî mîyan, binê yew simzêra xişî di ronişti, arisay. Xelasî heti yew meybi bî. Tanî livda ki anciyabî, qevdi bîbî, ina meybi ver di roniyyat bî û yew kerra ser niyabî, wişk û wa'di bîbî. Meybi miyan di çindi hebi puncanê bencirî kuho kerdînî. Buya vaş û velgî hameynî Xelasî.

Hajî Refo şî çindi goşey û zanqiley engura mazırma, gildani û surî ardi. Xelasî enguri miyan ra yew gûşey gildani girot werd. Nişka xu pîze di va "Înê yabanê xîr û xâli di aw çîna, cay ena engura nêşuta reydi ez nêwêş nêkiwa" û bi ino ters hinî enguri nêwerdi.

Arisayış ra pey Hajî Refoy va "Eki ti wazenî ma wardî", Xelasî serey xu tê şana û werîşti, rar kewtî. Şî Gomey Xal Zilfi resay., Xal Zilfi vazda hame vernîya jînî, bere persa, va:

-Bêrî yew qedîha çaya ma borî.

Xelasî vengê xwi nêkerd, Hajî Refoy va:

-Ma ganî şerî.

Xal Zilfi heti yew gede zî bi. Wexto ki Xal Zilfi û Hajî Refoy qalî kerdiñî Xelasî gedî ra hewniya. Meşki verra daybî, çila-na jey heyânî fekdî jey hameybî. Gede zî rik vindertî jînî ra hewniyaynî. Hajî Refoy ki Xal Zilfi ra xatir waşt, Xelasî zî waşt û ray mendî. Tanî puş û pelaxi miyan ra û beyntarî de rezan ra viyartû, şî key Hajî Refoy het. Keyî ra daşt bexçey jey bi. Hajî Refoy bexçey xu Xelasî nawit û ti ra va "Ti şo bexçî miyan, ez şona keye kelmelê xu ronana, yena." Xelasî şî bexçî heti ki çi bihewnîyo! Eki bexçey Hajî Refoy tam bexçey wo. Te de çi çino ki!.. Vamêrî, miro-yerî, sayêrî, dehlêrî, xerebêri, mişmişerî, sarincêrî, tuerî, încilewî û meybî bexçey di tê kewtîbî, bexçey xemilinabi. Zerzewatî ra zî isot, firinî, balcanî, cacixî, kuy, xiyarî ramiteybî.

Hajî Refo ki hame, o yû Xelasî şî bîrê Hajî Refoy ra hewniyay. Bîr pirr aw bi. Îna hasaynî ki ino bostan û inî darî heme, bîrê Hajî Refoy reydi awdiyaynî.

Bîrî heti ra şî binê yew tuyeri. Tuyeri qotkerda bî, xelîfanê jayê emserrînan bask dabi ver bi asmîn. Binê tuyeri di kilîmî û pelesî rakerdey bî. Sewbîna mêmânan Hajî Refoy estibî. Lajê Hajî Refoy mêmânan heti ronişte bi. Ey ki Xelasî dî, werîş pay, 'izzet û ikramî reydi ca da bere, başna nazbalî vîsti pey jey. Merheba cemâtî ra pey terraqi dewam kerd. Xelasî him cemât gûştaritînî him zî çaqîrnî xu ra hewniyaynî. Nîzdî jînî di, bostanî miyan di çend xencerekî û çend puncê pirparî hasaynî, villê cacixan û kuyan beriqiyaynî. Kirra qali ino bostano kuhoyo reng bi reng zav veş ba Xelasî şibi.

Cindî se'etî ra pey şami ardi jînî ver di ronay. Hemînî piya şamî wardi. Ti ra pey engur û hindî ardî, cemâtî û zî werdi. Tanînî va "Hûmay vêşî ko", tanînî va "Hûmay zêde ko", tanînî va "Hûmay cay jey deko".

Xelasî cematan di zav qalî nêkerdiñî, yew camêrdo giran bi. Goşê jey zî tikê giranî bî. Weş vîng nêşînî bere, hil û gam vatnî "Hê?" Xu ra ey zî ino kemaney xu zanaynî cûka zav qalî nêkerdiñî. A şewi zî tikêkî qalî kerd, hina-

## Hindik-Rindik

### NERM DIKE

Yekî Bektaşî rojeke Rojiyê bi rî ve ji xwe re încasan dixwe. Yekî Sofî dibîne ku wa ye mîrîkê Bektaşî rojiya xwe dixwe; bi qehîr dibêje:

-Malneket! Ma mîrîkê Musilman rojiya xwe dixwe? Tu qet ji Xwedê ji natîrsî?

Yê Bektaşî guh nadiyê, dibêje:

-Min rojiya xwe nexwariye, ez bi roji me.

Li ser vê, Sofî dibêje:

Lê ew telpika devê te çi ye?

-Yê Bektaşî edî mecbûr dibe û li xwe mukur tê, dibêje:

-Încas e di devê min de. Heta fitarê ez wê di devê xwe de nerm dikim.

### TELEFON

Yekî her du guhên wî jî şewitî, çû ser tixtor. Tixtor bala xwe dayê ku her du guh jî perîti ne. Tixtor got:

-Çawa bû, te çawa kir?

-Qet ne pirse tixtor, min pantorê xwe utî dikir, zîla telefonê lêket. Ji dêlî telefonê ve, min utî bi guhê xwe ve zeli-qand.

-Ê baş e guhê te yê din çi pê hat, ew çîma şewitî?

-Tixtor beg! Yanî tu dibê min ban ambûlansê jî nekira?!

**Amadekar: Z. Xamo**

## GÖLİNEN NAVDARAN

**Amadekar: Fırat Cewerî**

Zanîn dikare mirov têxe ser rîne çewt, lê bersîva vê zanebûnek hin çêtir û hin bêtir e.

**Asîmov**

Hin mirov hene bi zirecêba gerdûnê dizanîn, lê xwe nasnakin.

**La Fontaine**

Hemû tişte ez dizanim, bi tiştekî nîzanibûna min e.

**Sokrates**

Her peyakî mezin ne peyakî zane ye, her peyakî zane jî ne peyakî mezin e.

**Holmes**

Qîmeta netewekî, bi qîmeta kesen ku ew netewe anîne meydanê, tête pîvan

**John Stuart-Mill**

Gava yên xerab bibin yek, divê yên baş jî werin ba hev, an na wê yek bi yek winda bibin.

**Burke**

Yên ku hinin din zanibin zane ne, yên ku xwe jî zanibin biaql in.

**Lao-Tsze**

Zanebûn xizneyeke ku bi paş de nayê stendinê.

**Menandres**

Yên ku zanebûna wan zêde dibe, derdên wan ji zêde dibin.

**Încil**

Em nîzanîn, em ê bibin şî, lê em dizanîn em çi ne.

**Shakespeare**

Ji berdêla tu dê hin tiştan bi nîvî bizanibî, bi tiştekî nîzanibe çêtir e.

**Nietzshe**

Roj ki di-hîri qamî berz bi, Hajî Refoy û lajê xu mêmânan rî sépare ard rona. Wardîşê séparî ra pey newe ra terraqi dest pey kerd.

Qali qala inî dewan û mezrayan bî. Dewijan vatnî Qojigî, Hopî, Bibinoki, Gomey Verê Roy, 'ardê Bazbendi binê awa Berajê Qama Keyna Qirali di manenî; dewijen inî dewan heme ewta ra wardenî. Dewijan gore siyato ki hukmatî 'ardan ra nabi zav zav tanî bi û zirarê jînî bêhe-sab bi. Tanînî semedê qiyemetê 'ardê xu mehkema di de'wa aker-dibî, peynîya de'wa pawitînî. Xelasî fam kerd ki dewijî bêkeyf û bêhuzur i.

**Do dewam biko**

# XELASİ

## A. GİRAN

I  
Şewi ha yena mîyanê şewan. Aşmi tikê vejiyaya, hima çeher roja ya. Înî mîratê merşî ma war-dî, bil'aynayî. Nêverdano ma kişa kiwî. Ma aşma amnanîya peyeni Agustosi di yî. İna aşmi di dewi di derdê merşî nêancêno. Kê ewta Peyas di rehet nêkenî. İno mehlûq yew çîyo pîso heram o. Zav ezet û dej dano gandê kê. Yew ganîyo zav wîrdêk o, şewi kê çimbê xo jey zor veynenî. Kê 'ecêb manenî. Senî ino tewir çî inawa dej dano kê, kê wirneno û kê wayirê nêweşî keno?

Peyas yew dewa pabestey Diyarbekir a. Namey ja dew a, raştâ jey hinî yew semtê Diyarbekir hesibêna. Hindi Diyarbekir ra nîdî ya ki beytarê ja û lojmananê polisan hewtsey-heştsey mîtro yo. Nufusê ja nîzdî çeher hinzarî yo. Bêxeyra mezrayanê ja hewtsey keye esta. Yew dewa şen a. Ma'murî û 'emeley ki ewta roşenî, nimaj ra nimaj şonî suki. Wexto ki mektebî akerde yî telebey zî roj di hewî şonî şaristan, şan di agey-renî. Cenî şiktey nimaj bi nimaj şit û qatix benî suka Diyarbekir di roşenî û heta êrî ra yenî keye. Viyarnayîşê dewijan xalibi heywanan reydi beno. Qorî zî ma'murey, 'emeleyey, yan zî al-vêri reydi viyarnenî. Dewi di hewt-heşt dikanî, di qehwxaney û yew dikanê berberî esto. Gilangan qur-sê deşteni abeno. Keynekê dewi şonî qurs veynenî, guranê keyi bander benî.

Ciwan, waya jey, pîy jey û maya jey banî ser o qelibiyaybî. Merşî nêverdaynî Ciwan rakiwo. Weriş cila xu ser o roniş, exxa û puffa, vengi bî. Maya jey, pî jey û waya jey zî nişnayî rakiwî.

Ciwanî meraq kerdînî vatnî "eceba welatanê Awrûpa di ino mehlûq wedariyawo, nêwedariyawo?" Weriş pay, ina heta şî, a heta şî; vindertişê merşî çinêbi, pe de daynî. Jey hindi xu wurnabi hindi wurnabi ki guvdey xu tul-puznabi, wefirnabi. Hetanî şefeqê sibay bîbika xu pê ser nênay, nê-rakewt. Destê serê sibay hûnik ronîya. Merşey hêdî hêdî vila bî, xu nimit. Ciwanî zî çimê xu pi ya nay, xu di şî, kerra bi.

İno banê jînîyo herrin, a mehla di bananê en nêbiyayan ra yew bi. Mehla jînî di sewbina bano herrin çinêbi. Ciwan û maya xu, waya xu û kekê xu 'etiriyaynî. Hemînî pîy ra vatnî "Qey ma zî banê xu beton ra nêvirazenî?" Gedan ino kemane timo daynî ridê pîy xu ro. Pîy jînî gilangan ti ra cigeriyaynî, gilangan zî heq daynî bere, vatnî "De ez şima ra se vaja?" O zî 'etiriyaynî labrê çî ino hing di destê jey ra nêhameynî. Ray-ray zav 'etiriyayışî û qehran ver teterxan bînî, nêwes kewfînî, pîzey jey pendusaynî. Xu cili ser o derg kerdînî, duşunmîş bînî, hinzar çî aqil û xeyaldê jey ra vi-yartînî.

Zor-çî qiyami ino keye xu rî erinabi. Key jey û vi aşte û 'ersa jey pê ser o di sey û pâncas mîtro bi. Gorebê şeşti mîtroy ser o ban viraşte bi, a 'ersa bînî vengi bî. Wayirê banê bînî, di darê sarin-cêrî, panj tuyerî, çeher vamîrî ro-naybî. Semedê a şî hewşê jey ti-

kêna şen bi. Mehla jînî zav xirab nêbî. Peyas di terbê û ehlaqî het a ina mehla ser ra mehla çinêbî. Mehleyij û cîrânî jînî zav hewl bî, baş bî.

Pîy Ciwanî ge-ge şikir kerdînî, ge-ge zî îsyân kerdînî labrê gedanê jey û cenîya jey qebul nêkerdî. Vatnî "îllehî ti ma rî yew ban betun ra virazenî." Key jînî di ino pêkewtiş timo bînî. Pî, gedan û cenêki ra vatnî "Çî nêbeno. Zav familyey ma ra feqîrî. Yew banê mawo şidênage çino labrê ma mirdî nan wenî. Zavî veysanî, nan çino borî." Gedey jey vatisse xu ra tepe nêmendînî, jînî hezey xu vatnî, fam nêkerdînî. Cenîya jey gilangan qalê mîrdey xu qebul kerdî, vatnî "ina ya".

Pîy Ciwanî hewndê xu di dî ki gilana o yû gedey xu pê kewtî. Gama ki xu aqiliya şefeqê sibay piro dabi. Dîkanê nimajî veyn-daynî. Be'dî dor-mar vera vera roşn bi, rojî silam da, di-hîri qamî berz bi.

Waya Ciwanî ra vatnî Yewbîn. Namey maya jey Delali bî, pîy jey ra zî vaciyaynî Xelasî. Kekê jey Suwar yew şaristano pil di bi, weyra wendînî, ay hing di dewi di nêbi.

### II

Roj akewt, tînci da pêrunî ro. Xelasî gilana leheyf ant serey xu. Bineyna rakewt, hukmê rojî hina vîşî da piro. Meysan binê leheyfî di zî pe de da. İnawa rehet nêkerd, werişt pay, nardana darêni ro hêdî hêdî şî war; qaryola ser o xwi derg kerd, yew hîzari visti xu ser, newe ra kişa kewt. İno hing di Delali werişt, şî destmaj girot, be'dî hamey zerre, xu heta qelbi ra tada, nimaj kerd, qedêna, silam da. Nimaj ra pey verî werişt şî eyni ra yew-di dorkê aw ardî. Zerey dew ro qenalê aw zî viyartî. Awa qenalan beraj ra hameynî. Semedo ki qenâlî hina nîzdî bî Delali şî qenâlî ra da-des dorimî aw ardi, daranê hewşî ver kerd. Daran aw werdi, mirdî bî. Ti ra pey a nardanî ro vejiyay şî banî ser 'enê gedanê xu werezno. Weşeya hewnê serê sibay nîna vatis. Herçiqas meysî şînî gedan û nêverdaynî rehet busî zî è qayıl nêbî cili ra wardî. De de, Delali Ciwan we-rezna, ray kerd war. Yewbîn zî verika xu nay ardi war, be'dînî ageyray banî ser, cili hewa nay.

Ciwan yewndes serre bi, mekteb di jîhat bi, dersê jey zaf bas bî labrê maya xu celnaynî, dey rî ardim nêkerdî, zaf na's bi. Rehet nêvindertînî, şew û roj kay kerdî. Eynadey di jey ser ra kemî gedey bî. Delali ray-ray gerrey jey Xelasî di kerdînî labrê Xelasî qîmîş nêbînî piro do. Ciwanî panj serî mektebê vernî wendbi. Emser ver a 'enê pîy jey o ray kerdînî mektebê beytarî. Pîy jey ti ra vatnî "Ma veynî emser ti dersanê xu serî benî?"

Famîlya Ciwanînî Zazay bî. Înî key xu di Zazakî qalî kerdînî. Peyas di se keye Zazay bî, ay bînî Kurmancî bî. Wiriyew yew ca ra qertiliyaybî, hameybî ewta. Ciwanî çindi ray zav fizuley kerdî, hed ra vetibî, ay semed ra pîy jey o pîs kutbi. Tikê hamebi -şî ser

la beyntar ra tikê wext ki viyartbi hewna heway verenî bibi. Tib'etê xu terk nêkerdî.

Yewbîni, keyî miyan di şîrina şîrinan bî. Yew nazker û oynikeri bî. Çeher serrê xu qedînaybî, de-kewtbî sera panjini. Kekê ja keye di nêbi, Yewbîni timû qualê jey kerdî, vatnî "Keko mi vîrî kiwe-no". Rippî û xaxî lelerî kerdî, inî hewan reydi xu şîrin kerdî û daynî heskerdiş. Çiqas ki nimaj yan zî şan bînî, ganî pîy xu ra perey biwaştnî. Pîy ja zî zerra ja nêşikişînî, daynî bere, a berdînî xu rî pey vînce, balon û "şîrina çanqiliyaya" (atlî) erînaynî. Maya ja ti ra cigeriyaynî labrê a hewna heway xu kerdî, pîy xu ra perey waştnî, vatnî "Maya mi ra meva-jî". Zaf weş Zazakî û Kurmancî qalî kerdî, televizyon ra tikê Tir-kî zî bander bîbî. Emser zav me-raq kerdî, vatnî "Ez şona mekteb?" Pîy ja vatnî "Ney, hima rew o, verî zanê maya xwi weş bander bi, ti ra pey şo mekteb. Hetana ki kê şes serranê xu temam nêkî kê nêşonî mekteb."

### III

Gedey û pî xu hewn ra weriştî. Delali sufrey şeparey jînî rona, pêrunî piya şeparey xu ward, tengê xu şidêna. Xelasî hêz da xu, werişt, xwi hedirna, gedey xu temen kerdî, va "Qarmîşê yewî mebî, maya xu rî ardim bikî, ja meqeşharnî. İno çindi rojî yo ez veng geyrena, çî tembeley ra nê-vejêno, hîmî bes o. Ez şona Pîran, heywanan erînena, ana Diyarbekir di roşena." Dima keye ra vejiya şî Rarê Qenalî ser.

Xelasî al-vêrê heywanan reydi viyarnaynî. Bi ino hewa risqetê keydê xu dekerdî, vatnî "Şarî mîyan di wa gedey ma xax nêbî". Labrê viyarnayîşê jey indi baş nêbi. İno semed ra gedanê jey timo krîfîk jey kerdî.

Rarê Qenalî ser o qalê gedanê Xelasî, Xelasî vîr kewtî. Milul milul ver bi Çiftliga Haj Huseynî şî. Şî, Fabrika Xelîl Akgülî ver o viyart. Haj Huseynî heme tewir dar ronabi. Nîzdî rârî di dehlîrî, xerebêrî, sayêrî û sinc hasaynî. Gilê dehlêran û xerebêran tê şanî-yaynî, xuş-xuş kerdînî. Xelîl Akgülî zî bexçey fabrika xu di darê êmîşî ronaybî. Darê jey durî ra daranê sayêran û mişmişêran mendînî. Qenal beytarê rârî û Bexçey Xelîl Akgülî ra viyartînî.

Xelasî bineyna şî, qehwxaney 'Elî resa. 'Elî zî bexçey qeh-wexaney xu pey daran xemilnabi. Mişîrî jey binê seja daran di roniştîbî, çaya xwi şîmitî. Emser aw zav bî. Şarî zerzewat, tetun û peme mirdî aw daybî. Xelîl Begî zî zav tetun ramitbi. Desduyes seran ra ver -semedo ki hima beraj nêviraziyabi-hêgâyî inî dormaran awî nêbî. Cêkû beraj viraziyawo, 'emelan dekenî "motoran" yanî traktoran, pirr kenî, benî pey pemey xu çînenî labrê tikê ucret danî bider. Semedî awa berajî ra, verî gore mîleti ewta hina tanî betal manena. Hewna zî bêkar û destvengî zav i û şonî qehwan di roşenî. Xelasî wexto ki qenâlî ver o şî, inî qalî hamey aqildê jey. Tikêna şî, pîrî ra vi-yart, dolmîşa dewi hamey jey het ro şî. Şoforî dolmîşa qorna cenay, veypda bider da, o nêwenîş. Be'dî xwi vist pompola Sîwerregi ser. Xwi ra cor asmîn ra hewniya, hewrî bestiyay bî. Çindi deqîqan ra pey rişîş varanî hêdî hêdî vara

la vera vera vêşî bi. Xelasî xu da daldey dîrega 'eltîriki, tuncî ra ronişt û pawit. Lojmanan heti ra yew dolmîşa hamey ki dolmîşa Berê Koy a. Keyfî jey hamey, lezi kerd şî dolmîşa wenîş, zor-çî qiyam xu varanî ra xelisna. Wexto ki dolmîşa lojmananê polisan ra viyarti şî nîzdî Hefishaney Baxleran tena ino welat di nê, din-ya ra vila bîbî. İno hefisxane ki hame Xelasî vîrî, keyfî jey rema.

Dolmîşi Lîseya Baxleran, Ofîs û Wilayet ra viyarti, şî Berê Koy. Weyra heme kes peye bi.

IV  
Xelasî Berê Koy di şî cay oto-busa Pîranî. Otobusa Pîranî nîm se'eü erey werişt, se'et û nîm ra

Dewamî ci riperê 9. di

## HİM KİŞENÎ HİM DANÎ MEHKEMA

### Hesenî GİRAN

Eyro ma şî mehkema hedîsey cinaza Wedatê Bismîlijî (Vedat Aydînî). Namey mehkema, Devlet Güvenlik Mahkemesi yanî Mehkema Emniyetê Dewleti yo. Cay ina mehkema di çend serrî ra ver Xestexaneyê Numûni (Nümune Hastanesi) bi, inka ewta kerdî mehkema.

Ma Xestexaney Zacilanen (Doğum Hastanesi) ver ro viyartî, tîman, polisan û esker ramit vernîya ma, oxirê ma birna, nêverda goşdaroxî şîrî bînaya mehkema. Va "Emir söyle" (Emir inawa wo). Wayirê selahiyetê tanî müsesseş, gazetenuştoxi (gazeteci) û avukatî viyartî ki şîrî labrê hetana ki şî zerrey bînaya mehkema, tîman û polisan di-nîrénâ ray ê sa'nay (aremî kerdî). Wexto ki waşt avukatan bisa'nî, avukatî jînî ver o hamey (qarşı vejiyay) labrê pere nêkerd. Goştaroxan ay dor-marân di, dêsan ver di pawit.

Ina bîna, bînayêda veren a. Darê cinarı yê "se serrey" te de estî. Eyro ina bîna di 52 tenî tebişte (tutuklu), 274 tenî zî netebeşte (tutuklusuz) mehkema biy. Da'wa 29. 8. 1991 di dest pey kerdi labrê ay roj ifadey tebiştan nêqediyabi, eyro dewam kerd.

Tebiştey ardi salonî di roşanay. Rêzîl û kelemçey jînî akerdî. Pancşes hebi eskerî, çend gamî yewnan ra durî "hezirol" di vindertîbî, xwi titiknabi. Avukatan û goştaroxanê ki şînabi bîrî zerre, cay xwi girot (Çewres û hîrî avukatî dekewî ina da'wa). Heyetî mehkema zî abi asan cay xwi di roniş, dest pey kerdi ifadey girotî labrê girotîş ifadan zav derg ramit. Tebiştan ra zavînî va:

- Ez nêdekewta cemâtî cinaza miyan.

Tanînî va:

- Ez semedî cinaza ra şîya labrê mi suc nêkerd. Polisan û tîman tifingî ma ra nay, hîfîkopteran bomba mijî (sis bombası), bomba gazını (gaz bombası) û bomba şewatî (yangın bombası) visti ma ser. Mi bêhemdî xwi, xwi Lewey Ewselfî ra vist war. İni xwivîştişî di gelek mîrdîmî birîndar biy.

Qorrînî zî qalê işkencî kerd, va:

- Polisan qereqol di keynekî, cenî, camêrdî û xorî rut kerdî; heqeret ma kerd, nengî bi ma û Wezîrê Karanê Zerî (İçişleri Bakanı) Abdülkadir Aksoy çinay. Hetta yew polisi ma ra va "Ma şîma tebişenî, mehkema şîma vera dana, şîma hewna kena belay serey ma" û nengî mehkema zî çinay.

İfadân tebiştan ra pey mehkema heqê qalîkerdişî di avukatan. Avukatan ra Mustafa Özerî zav sert qalî kerd, va:

- İddianamey şîma di nusiyawo ki inî mîrdiman slogan visto, vato "Kurdistan do Tîrkan rî bîbî gorr!" İno slogan şâş nusiyawo. Ez bi xwi şahidî nê hedîsi ya. İno slogan polisan bi xwi pê ardo, sawcî zî dekerdo iddianamî miyan. Slogano ki raştiko (raştî) erîzi, inawa bi: "Kurdistan do faşîzm rî bîbî gorr!" Ez bi xwi zî ino qene'et di ya, kam cayê dinya di faşîzm esto, helbet wa ay ca faşîzm rî bîbî gorr! Eke faşîzm Türkiye di esto, wa weyca zî jey (dey) rî bîbî gorr!

Dim a Av. (Avukat) Hüseyin Turhallî'ya avukatan ver a yew dîlekçaya piya (müstererek) imzakerda day mehkema. Tikê dîlekçaya wendi, ge-ge zî fek ra (ezber ra) qalî kerd. Dîlekçaya di vatnî:

- Rojê merasimî cenaza di, yew qetî'am viraziya; heşt mîrdiman şîsiyay, çend sey tenî zî birîndar biy. Sucdarê inî qetî'amî Serekkomar (Reisicümhûr), Serekwezîr (Başbakan), Wezîrê Karanê Zerî yê Tîrkiye û Walîyê Mîntîqa Hayri Kozakçioğlu yi. Çîmkî ayananî ki emir da tîmanê xusûsiyan, polisan û eskeran inî bi. Hina zav tîman wezîfey xwi ard ca, şar kiş. Ma heqdî qirkerdoxanê milleti di, kiştoxan û birîndarkerdoxanê mîrdiman di gerrey xwi danî zanayış, ma şikayetkerdoxî. Wa meqâmî mes'ulî derheqîdî jînî di mu'amele bîkî.

Hüseyin Turhallî'ya pey Av. Hüseyin Tayfun, Av. Hüsnîye Ölmez, Serekê Baro'yê Diyarbekir Av. Fethî Gümüş, Av. Hasan Hüseyin Reyhanlı û Baro'yê Estembûl ra di avukatan qalî kerd.

Hasan Hüseyin Reyhanlı'ya va: - Ez qetî'amkerdoxan protesto kena!

Serekê Mehkema, qala jey birnay labrê ey hewna zî çend qalê wişkî kerdî.

Peynî di mehkema 52 tebiştan ra 46 tenî texliye kerdî (verra day). Abdülmuhîn Melik, Abdülmecit Argül, Medeni Uğurer, Seyithan Bozkurt, Abdülvahap Kaba û Ahmet Gümüş verra nêdiyay. Mehkema jînî taloq bî hetanî 1. 10. 1991.



# Armanc û Sansur

Hesen Mizgîn

Nivîseke min a din jî kete sansurê. Li gor hevalên redaksiyona Armancê\*, nivîsa min tiştên "anormal" tîne zimên. Hevalên redaksiyonê gotina sansurê hîç qebûl nakin. Ji bo wan nivîsên min an "anormal" an jî "ne pêwist û bêwext" in û jî ber vê yekê jî nakevin rojeva redaksiyonê. "Dema ku nivîs nakevin rojeva redaksiyonê, nayê wê manê ku têr sansurkirin". Xuya ye hevalên redaksiyonê ji gotina sansurê hîç hez nakin.

Îcar ku nivîsek nekeve rojeva redaksiyona kovar an jî rojnamê û jî ber "anormal" û "ne pêwistbûn û bêwextiya" xwe neyê weşandînê, jê re çi tê gotin bila xwendevan bi xwe nav lê bikin. Bi ya min sansur e ne tiştekî din.

Hevalên redaksiyonê tenê bi sansurkirina nivîsên min namînin. Ew dixwazin fîkrîn min, bîr û baweriyê min jî "terbiye" bikin. Li gor van hevalan divê ez şaşitîyên ku me heyâ iro kirine nebêjim. Anglo divê ez nebêjim ku me di siyaseta enternasyonalizmê de gelê xwe feda kir, an jî me xwe wek leşkerên enternasyonalizmê didît. Li gor hevalan divê ez nebêjim ku me kadirên xwe he land an jî me nehişt ku abûqatek, doktorek nivîskarek, mamesteyek bi rîkûpêk ji me derkev. Divê ez nebêjim ku me nehişt abûqat, doktor, mameste û hwd. gavek jî pêşde biçin, bêrevajîya vê yekê me ew paşde xistin û ew roj bi roj ji ber çavan hunda bûn.

Li gor hevalan divê ez nebêjim ku em berî her tişti dîroka xwe fêr bibin. Divê em dîroka xwe munâqeşe bikin; ne Stalnîzmî, Lenînmîzmi û hwd.

Di siyaseta me ya Rojhilata Navîn de yêk ku dijiminê gelê Kurd in xuya ne û dijiminê wan jî xuya ye. Lî divê ez nebêjim ma

em ê çîma dijiminê dijiminê xwe bikin dijiminê xwe! Ma dema ku em siyasetek wiha bajon naveroka têkoşîna me wê çi bibe? Ma em bi dijiminê xwe re nakevin "ittifaqê" tabî? Belê divê ez qala dostaniya Îsraîlê û gelê Kurd nekim. Dema ez vê yekê bikim ez xwe bi xwe îñkar dikim. Lî ez nizanim gelo navê "ittifaqa" bi dijimin re çi ye?

Dê niha bête pirsîn "Hesen Mizgîn" qala çi ittifaqê dike, em bi dijimin re tu caran neketine ittifaq? Bersîva min pir basit e; Tirkîye, Iraq, Îran û Sûriyê her yek li gor hin sebeban an jî ji ber sebekê dijîtiya Îsraîlê dîkin. Em Kurd jî dijîtiya Îsraîlê dîkin û dibêjin ku ew peyayê emperyalizmê ye, gelê Filistînê qir dike û hwd. Tişte ku em dibêjin hema hema dijiminê me jî dibêjin. Bawerî yan jî daxwaz her çi dike bila bike di dawiyê de em bi dijiminê xwe re dikevin xetekê, em jî şîfara dijiminê xwe davêjin. Ma ev ne ittifaq e çi ye?

Li gor hevalan ev tesbit an jî analîza min tiştekî "anormal" e. Tiştên "anormal" di Armancê de nayê çapkirin. De baş e ku ez jî bêjim hevalno her tişte ku hûn dibêjin "anormal" e wê çi bibe? Heval bi rehetî dikarin bibêjin "di redaksiyona me de demokrasî heye. Eger piraniya hevalan bêjin erê/na tu problem namîne". Îcar ku "anormal" û "bêwextî" tim bibe sebeba neweşandina nivîsan, ji yekî re riyek bi tenê dimîne; ew jî xatir xwestin e. Lî ev yek ne karê min e. Min jiyanâ xwe daye vê rîcîka han û zû bi zû jî dev jê bernadim. Heya ji min bê ez dê hewl bidim da ku bi hevalên xwe re xebata müşterek bidomînim, heyâ ku alternatifkeke mantiqî derkev holê.

(\*)Qesta min ji hevalen Redaksiyona Armancê ji bil S. Rêving û M. Lewendi ye.

## ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Rêncberê Hindî Kapîla Kumara Singhes di 1981'an de 151 saet bê westan li ser filosofiya Budîzmê peyiî û di peyivandina dirêj de rekôşîkînand. Lî di 1986'an de karkerê fabrikê E. Javranan (54 salî) li Parka Cuddalorê li başûrê Hindistanê ji vê rekore buhûrî û li ser her xistin di navîlera asûman û erdê de tam 165 saetan peyiî.


Dewleta ku cara yekemîn dardekirin ji hôlê rakir -di 1798'an de tayn e.

Narkotikê, di 1987'an de nêzî 323 milyar dollarî narkotik (es-tertîbî) standine û firotine.

Tac Mahal e. Tac Mahal II Hindistanê li  
avahiya delal ava kî  
xira bikin û mu  
ketin.

# BEROS

AŞXANA SERVEKIRİ



Mahmûd Lewendi

## BEROS; AŞXANA SERVEKIRİ

Li vî welatî gelek caran xelk yan ji xwe re xanîyan dikirin an jî dikanan vedikin. Ü ne neheq in ji. Çimkî, dikan, xanî an jî perçeyek erd ji bo rojîn pêş garantîyek e. Te dî dunya ye, çi dibe çi nabe, mirov pîr dibe, dikeve ber destan, loma, ez fikirîm ku ez jî ji xwe re ji bo rojîn pêş garantîyekê bi dest xim, bibim xwedî tiştek. Lî xwedî bela banqecîyan bide, qudûmê min şikandin, qredî nedan min. Mala min viriti. Welê xuya ye ku istiqbaleke rût û tazî li pêş min, li benda min e. Ne xanîyek, ne perçeyek erd!

Qey hevaleki ji Armancê bihîstiye ku istiqbala min rût e, telefonî min kir daku alikarîya min bike, got: "çawa be perçeyek erdê te jî tuneye, were ez perçeyeki ji rûpelên Armancê bi deyn bifroşim te!" Min jî got "baş e" û min kîrri. Pêşî min xetek li çarmedori vî perçeyî kişand. Paşî min li ser lewhaye-

kê navê xwe nivîsand û di vî perçeyî de çikand. Nuha ez jî edî bûm xwedî perçeyek erd -pardon- yanê kaxez.

Îcar ez fikirim, ez çi bikim çi nekim, wele baştır ew e ku li ser vî perçeyî aşxaneyeke servekiri vekim. Ü hema yekser ez çum malê, her çendî fer û folen me ne pir in jî, lê beroşek me heye. Wele pişti xire-cîra bi jînîkî re, min beroşa malê girt û anî danî ser kuçik û agir da binî. Min hundurê wê jî tiji zérzewat kir. Hela em binérin wê çi xwarin ji beroşa me derkeve.

Ha, tiştekî din jî, navê aşxanê jî weha ye:

**Beros; Aşxana Servekiri**

Teb'en beroşen xelkê her évar dike- lin, lê ya me ji ber feqîrî û tunebûnê wê mehî carekê bikele. Ger em tu tiştekî nebînîn, emê nivîskarîn xwe di beroşen de bikelînîn û piştre emê dest bi xwen- devanan bikin.

## SÎRKET

Du kurd wexta ku werin ba hev û li qah- weyekê rûnîn, pêşî behsa siyasete dîkin, çend partîyan ava dîkin. Paşê yekîtiya wan partîyen ku di wê suhbeta xwe de li ser masê avakirine çedîkin. Piştre, wê yekîtiye xera dîkin, bi hev dikevin. Pişti demekê dîsa li ser wê masa ku bi hev ketibûn, li hev têr, dîbin dost. Îcar, dîsa li ser wê masa ku bûbûn dost, dest bi nivîskarîyê dîkin. Pêşî çend meqaley- an dinivîsin, kovar û rojnameyan derdixin. Paşê dest bi derxistina çîrok û romanen dîkin. Piştre dîsa di nav wê suhbetê de, li ser wê masê, weşanxaneyeke datînîn. Kitêban çap dîkin. Kitêb nayêni firotin. Zerarê dîkin. Bi ser nakevin. Dîsa li ser wê masê dev jî weşanxaneye jî berdidin. Li çareyek din digerin. Behsa dikanan dîkin. Ji xwe re aşxaneyeke vedikin. Dîsa bi ser nakevin. Netice; dîsa ve- digerin seri û "na lo, bê sîyaset nabe...!" û qahweyek din jî vedixwin û radibin diçin.

Îcar çend roj berê ez û hevalek, em jî xwe re li çayxanekê rûniştin. Me jî di suhbeta xwe de gelek tişt ava kîrîn û xera kîrîn. Dawiyê me li ser reklamê li hev kîr. Emê şirketeke reklamê ava kîrîn. Bi her zimanî reklam dîbe, çîma bi kurdi nebe? Û welle me şirketa xwe danî. Me navek jî lê kîr;

**TENDÛR: Şirketa Reklamên Kurdi.**

Hunê nuha bibêjin "çîma ne navekî din, çîma Tendûr?" Çimkî her tişte ku em nuh ava dîkin, divê li ser bingeha urf û edetên milletê me be. Di nav milletê me de jî, cara pêşî reklama belaş li ber Tendûrê hatîye kîrîn. Mese- la li gundan wexta ku jîn diçin ber Tendûrê, hem nanê xwe dipêjin, hem jî behsa gundiye xwe dîkin. Reklama kurê filankes dîkin, pesnê keça filankes didin. Behsa mellê gund dîkin. Der heqê zêrên bükîn nuh de diaxifin. Axirê ez serê we neêşînim, behsa

Vexwe COLA  
Bibe pola !

Li dawet û dîlanê  
Vexwe çaya SEYLANE !

Tasek av û ASPIRİN  
Namîne êş û birîn !

ASPIRÎNEK û tasek av  
Êş û jan diçin ji hinav !

Cixara me soro-moro  
Em dikşînin MARLBORO

Lezzet û ta'm û xweşî  
Tu jî MARLBORO dikşî?

Kî hat?  
Mendo hat.  
Bi çi hat?  
Bi FİAT !

Erd qelişî  
Eşman felişî  
Brûskê veda  
VOLVO'yê deng da !

Kurê Evdalê Zeko  
Xwedîyê saeta SEIKO !

## MEHELLİSTAN

Belediya Diyarbekirê di bin serokîya muawînê serokîya Belediyê de grûbeke muzikê çekirine ku wê bi Kurdi sitranan bixwînîn. Di repertuvara wan de li gel sitranen Kurdi yêni mintiqê, sitrana Helepçe, Rabe Cotyar Rabe, Canê Canê jî heye. Belediyê hemûyê van sitranan li gel wergera wan a Tirkî dane wciyê (mudeiumum) Diyarbekirê da bikarîbin izin bigrin. Ü di daxwaz xwe ya ji bo izinê de jî, di şûna kuru de, lehçeya mehelli nivîsine.

Bavo, bila izinê bidin, bila navê wê lehçeya mehelli be. Ji xwe navê vî milleti her roj tê guhertin; "Tirkîn Çiyayî", "Xelkê Bakurê Iraqê", "Etnîk", "Rohîlatî", "Xelkê Separatist" û nuha jî "Mehelli"

Yanê Grûba Muzika Mehelli, Zimanê Mehelli, Xelkê Mehelli û welatê wan Mehellistan.

Hela em binérin, pêşde wê hîn çend navê din li me kin.